Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 72
30'ê Îlonê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Erdoxan: Kurd Ne Kêmnetew In

Serokwezîrê Tirkiyê, dîsa bi nîsbet pirsa kurd Li New Yorkê serê wî li belayê ket. Her kes ji rojnamevan û siyasetvan ku rastî wî dihatin, behsa pirsa Kurd pêre dikirin. Wî jî her car bi uslobekê bersiva wan dida.

Wî di bersiva Serkomarê Îrlandayê de got ku rewşa kurdan baş e û tu pirsgirêk ninin. Dîsan di civîneke din de rastî vê pirsa ne bi dilê xwe hat û got: Kurd tu caran kêmnetewe nebûne û ew hewil didin rê li ber pêşiya zimanê kurdî vekin û ew li ser dixebitin ku di destûra bingehîn de guhertinan çê bikin.

### Peyama Deftera Siyasî Bi Boneya 15'mîn Salvegera ...



2

### Çalakiyên Rêzgirtin Ji 15'mîn Salvegera...



5

### Dr. Şerefkendî, Şoreşvanekî Mirovhez




7

### Zarok û Xwendewarî



8

### ÇIMA ZIMAN?




9

### Taybet Bi Boneya 15'mîn Salvegera Şehîdên Berlînê...



# TERORA MÎKONOSÊ XALEKE REŞ LÎ SER ENÎYA KOMARA ÎSLAMÎ



Bi boneya 15'mîn salvegera terorkirina Dr. Seîd Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê Partiyê li derveyî welat, Humayon Erdelan nûnerê Partiyê li Almaniya û Norî Dêhkurdî dostê Partiyê li xwaringeha Mîkonosa Almanyayê, rê û resm û semînarên cur bi cur hatin lidarxistin.


Di binkeya Deftera Siyasî ya Partiyê de rê û resmek hêja bi beşdariya Sekreterê Giştî, endamên Deftera Siyasî, endamên rêberiyê, Kadr û Pêşmerge û malbatên wan birêve çû.

Herweha li Goristana Pirlaşizê de jî rê û resmek bi beşdariya kek Hesen Şerefî û bi sedan kes ji endam, alîgir, dostên partiyê û azadîxwazan birêve çû.

Herweha bi vê boneyê li Navenda Sê a Kurdistanê û li gelêek welatên Ewropayê de bi girtina semînaran, yad û bîranîna şehîdên Mîkonosê bilind hate nirxandin.

*Raporên berfireh di rûpela 5'a de*

## Senata Amerîka Sipaha Pasdaran Bi Terorîst Binav Kir



Li gorî nûçeyan li çend rojên borî de, Senata Amerîkayê bi zorîniya dengan, rezamendiya xwe li ser xistine nava Sipaha Pasdaran di lîsteya reş a terorê de nîşan da.

Binavkirina Sipaha Pasdaran wekî rêxistinek terorîstî ku berê ji aliyê Kongireya Amerîkayê ve jî hatibû erêkirin, ger ji aliyê dewleta Amerîkayê jî bihê pejirandin, wê demê dê Sipaha Pasdaran û kompaniyên girêdayî bi wê, dê tevî dorpêçên xurt yên aborî berbirû bibin.

Hêjayî gotinê ye ku Komara Îslamî di dijkiryarekê de ew kare bi kiryarek neberpirsane û neqanûnî da zanîn û mehkûm kir.

Her wiha Berdevkê Wezareta Karê Derve ya rejîmê ragihand: "Bi terorîst nasandina hêzek leşkerî ya welateke endamê NY'ê, kiryarek ecêb û bêmînak e".

## Destgihîştina Îranê Bi Çeka Navkî Xeternak E



Di civîna giştî ya NY li "New York"ê de, Angêla Mêrkil da zanîn: Eger destê Îranê bi çekên Navikî re bigîje, dê bibe welatek gellek cihê xeterê.

Wê diyar kir: Komara Îslamî ya Îranê heya niha biryarên Konseya Ewlekarî ya NY piştguh xistiye û berdewam gefan ji Îsraîlê dixwet.

Wê got: parastina ewlehiya Îsraîlê bo gotûbêjê nabe.

Wê herweha zêde kir ku eva erkê welatên cîhanê nine eşkere bikin ku Îranê çeka Navikî heye, berevajî wê, eva erkê Komara Îslamî ya Îranê ye bi cîhanê re bide selmandin ku çeka Etomî nine.

Wê di dawiya axavtina xwe de gef ji Îranê xwar ku ger di pêxema razîkirina Neteweyên Yekbûyî de gavan neavêje, divêt çavnihêriya ambargoyên zêdetir û xurtir bike.

www.arsivakurdi.org

# Peyama Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya 15'hemîn Salvegera Şehîdbûna Dr. Sadiq Şerefkendî Û Hevalên Wî

### Ji aliyê birêz Mihemednezîf Qadirî ve hate pêşkêşkirin

*Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!*
*Xûşk û birayên xweştevî!*
*Mêvanên hêja!*

Ez ji aliyê Polîtbîroya PDK Îranê ve, ji bo beşdariya we di rê û resma 15'hemîn salvegera şehîdbûna rêberê mezin yê gelê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û hevalên wî, bi germî xêrhatina we dikim. Bêguman beşdariya we di vê civînê de, ji aliyekê bicîgehandina erk û wezîfeya neteweyî û mirovdostane a we û rêzgirtin ji xebata bi şan û şeref û birûmet a vê koma xebatkarên gelê me û asûdebûna riha nemir a wan e û ji aliyê din ve jî bo careke din nîşandana kerb û bêzarî ji teror û terorîzmê ye.

**Xûşk û birayên rêzdar!**

15 salan berî niho hevalê xebatkar û mandînenas Dr. Sadiq Şerefkendî ji bo encamdana erk û xebatên siyasî û partiyê sefera Ewropayê kir. Piştî çend rojan gihîştin bo Ewropayê, bi armanca beşdarîkirin di Kongireya Enternasyonala Sosyalîst bi serokatiya şanda nûneriya PDK Îranê sefera welatê Almanya kir û li bajarê Berlînê beşdarî di wê Kongireyê de kir û gotara PDK Îranê pêşkêş kir û bi awayekî çeleng di bas û nîqaşên Kongireya han de beşdarî kir. Piştî bi dawîhatina Kongireya ES'ê, li gor bernameyeke diyarîkirî, êvariya roja 17'ê Îlona 1992'an, bi merema bîr û ra guhertin û gotûbêj li ser rewşa siyasî a Îranê tevî nûnerên beşek ji partî û rêxistinên Opozîsyona Îranê li xwaringeha Mîkonos a Berlînê li hev civiyan.

Li pey demeke kurt ji pêkhatina civiyana wan, terorîstên rejîma Komara Îslamî a Îranê ku ji cihê civînê hesiyabûn, xwe gihîjandin wir û gellek hov û bêrehmane ew dan ber êrîşa çekên xwe û bi vê kiryara terorîstî, careke din şanda PDK Îranê ku pêkhatibû ji Dr. Seîd Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê Partiyê û Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê ê wê demê li derveyî welêt, Humayûn Erdelan, nûnerê partiyê li Almaniya û Nûrî Dêhkurdî, kesayetiyê siyasî û dostê qedîmî yê partiyê hatin şehîdkirin.

Bi vî awayî rejîmê cinayeteke din derheq Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û gelê azadîxwaz ê Kurd û hemû ew kesên ku li seranserî dinyayê dilê wan ji bo azadî, demokrasî û biha û nirxên mirovahiyê dikute, afirand û rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê jî ku biryara ew tawana mezin dabûn, rûpelek reş a din bi dîroka tejî şermezarî û riswabûna xwe zêde kirin û bi encamdana vê cinayetê careke din ketin ber kerb û kîn û bêzariya civata navneteweyî.

Gelê Kurd û PDK Îranê hêşta birîna bikul û jan û şehîdkirina rêberê me yê navdar Dr. Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û hevalên wî bi destê terorîstên



Komara Îslamî a Îranê li bajarê Viyenê derman nekiribû, xeberê nexweş û dilêş yê vê bûyera samdar gihîşt me û gelê Kurd careke din tazîdar kir. Diyare rejîma Komara Îslamî a Îranê ji dîrokê ebretê wernagire û nizane PDK Îranê di dîroka tejî serbilindî a xwe de, rastî dehan bûyer û qewimînên wiha hatiye û li hember van hewl û bizavên dijminên gelê Kurd de qahîm û mikumtir xebata azadîxwaziya gelê Kurd didomîne.

Dîroka tejî rûmet a partiya me jî ev rastiye selimandiye ku piştî şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed û Dr. Qasimlo bi çi awayekê xebatkarên PDK Îranê di çepera hêvî û xweziyên wan ên serfirazane parêzvanî kirin. Piştî şehîdkirina Dr. Seîd jî rêberiya PDK Îranê û Kadro û Pêşmergeyên qehreman û gernas ên partiyê bi piştgiriya civatên xelkê Kurdistanê ji rejîma Komara Îslamî a Îranê re selimandin, di vê kiryarê de jî weke hemû kirinên xwe ên din şaş û xelet in û nikarin qameta bilind û biheybet a PDK Îranê biçemînin.

**Xûşk û birayên rêzdar!**

Rêber û xebatkarê navdar ê gelê me, Dr. Sadiq(Seîd) Şerefkendî xwediyê gellek taybetmendî, şiyan û karînên bêmînak bû, her ew karîn jî bû ku piştî şehîdbûna rêberê me yê mezin, pir zû nîşan da xebatkarekî xwedî karîn yê Partiya Demokrat û diyariyekî jêhatî yê Dr. Qasimlo û rêberekî bilîmet yê gelê Kurd e. Her eva jî bû rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî a Îranê bi danîna vê kompiloya terorîstî şehîd kir.

**Hevalên qedirgiran!**

Baskirin li ser jiyan û xebata rêberekî navdarê Kurd derfeteke zêdetir dixwaze, lê di vê bibîranîna pîroz de, ez bi hewce dizanim bi kurtî qala jiyan û xebat û tekoşîna vî şehîdê mezin bikin.

Rêberê xebatkarê yê partiya me Dr. Seîd sala 1316'an a Rojî(1937) ji malbateke şoreşvan û welatparêz ya Kurd li gundê Terexe a Bokanê ji dayîk bûye. Dema ku hêj zarok bû, bavê wî koça dawiyê kir û ji nazkirinên bav bêpar bûye. Lewra serperiştîkirin û xwedîkirina wî ketiye ser milê birayê mezin yê wî, Mamosta Ebdulrehman Şerefkendî naskirî bi Mamosta Hejar, kesayetiyê navdar û helbestvanê mezin yê Kurd.

Xwendina destpêkî heta qetandina qonaxa dîplomeyê li bajarên Bokan, Mehebad û Tewrêzê derbas kiriye. Piştre ji bo domandina xwendinê çûye "Danişsera"ya Bilind a Tehranê û sala 1338'an Lîseya Kîmiyayê wergirtiye. Li pey kutakirina xwendinê, vegeriyaye Kurdistanê û li bajarên Mehebad û Urmiyê erkê pîroz yê dersbêjî(Mamostayî)yê bûye. Bi sedema zanayî, jêhatîbûn, xweştevîbûn û hesta welatparêziyê ve ji aliyê dezgeh û navendên sîxor û ajanên rejîma Paşatî ya Mihemedriza Şah ve tevî çend kes ji hevbîrên wî ji bo bajarên Erak û Kerecê hatin dûrxistin.

Sala 1351(1972)'an ji bo domandin bi xwendina bilind karî ji borseya Wezareta "ulûm" (Zanistê) mifahê bistîne û biçe welatê Fransayê.

Sala 1352(1978)'an, ji rêya rêberê zana yê gelê Kurd Dr. Qasimlo tevî armanc û siyasetên PDK Îranê nasyar dibe û xebata xwe a siyasî bi partiyê re dest pê dike. Piştî wergirtina Doktorayê, sala 1355(1976)'an vegeriyaye Tehranê û bû mamostayê Zanîngehê.

Dr. Seîd serbarê erkê mamostayiya zanîngehê, tevî xwendekar û mamostayên zanîngehê û welatparêzên Kurd pêwendiya siyasî û rêxistinî pêk aniye û bi Dr. Qasimlo re jî têkiliyek berdewam û ser û ber pêk aniye. Piştî serkevtina Şoreşa Gelên Îranê, Dr. Şerefkendî wekî tekoşerekî demokrat û kesayetiyekî naskirî yê siyasî di nav Kurdên Tehranê rolek berçav lîst. Bi sedema jêhatîbûna wî, sala 1980'an bû Ravêjkarê Komîteya Navendî a PDK Îranê û ji wê demê heya dema şehîdbûnê bi awayekî jêhatî erk û wezîfeyên partiyê birêve bir û pileyên siyasî û rêxistinî yên partiyê yek li pey yekê bi serkevtî derbas kirin. Bi taybet dû şehîdbûna Dr. Qasimloyê nemir erkê xwe bi rûmet û serbilindî meşand.

Herwekî min bas kir, Dr. Seîd xwediyê gellek xislet û taybetmendiyên bilind bû, liv û riftarên jêhatî hebû. Di kar û xebatên partiyê de rêberekî zana û jêhatî û xwedî şiyan bû, rêberekî bi bername û mandînenas û bêrawestan bû. Tevî hemû cure diyardeyên kirêt ên siyasî û rêxistinî ku derbeyê ji pirensîpên partiyê bigehîne, xebat û berxwedanî dikir. Li dijî bê usûlî û serberedayî û derfetperestiyê bû. Ji mirovên şoreşvan û bi bîr û bawer û xebatkar re hez dikir. Hem di gotin û hem di kiryarê de rûçikekî demokrat û Kadroyekî payebilind yê PDK Îranê bû. Li piraniya organên partiyê de cî destê Dr. Seîd xuye bû. Di Radyo, Rêxistina nepenî û weşanên partiyê de û aqibet di pêwendiyên navneteweyî de Dr. Şerefkendî nîşan da ku rêberekî mezin û bi şiyan yê partiya me û kesayetiyekî xwedan helwest e.

Xebatkarê din yê vê bûyerê kekê Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê wê demê ê PDK Îranê li derveyî welêt bû. Kek Fetah yek ji Kadroyên çeleng ê partiyê bû, her ji destpêka xebata siyasî a xwe di refên partiya me de, heta pileya

www.arsivakurd.org

Komîteya Navendî bi serkevtî bihurand û erk û wezîfeyên şoreşgerî ên xwe birêve biriye.

Di berpirsiyariya xwe a dawî jî ku nûnerê partiyê li derveyî welêt bû, bi awayekî jêhatî xizmet bi armancên partiya me a xebatkar kir.

Şehîdê din ê me, kekê Humayûn Erdelan, nûnerê PDK Îranê li welatê Almanya bû. Kek Humayûn wekî rewşenbîrekî bi bîr û bawer û di xizmeta armancên neteweyî ên gelê Kurd bû û erkên siyasî û wd...yên partiyê dimeşand.

Goriyên din ên bûyera Mîkonosê, birêz Nûrî Dêhkurdî xebatkarê rêya azadî û demokrasiyê û dostê dêrîn yê partiya me bû ku beşek zaf ji temenê xwe di pêxema xebat ji bo wan armancan de terxan kiribû û aqibet di wê rêyê de jî jiyana xwe ji dest da.

Şehîdbûna xebatkarekî navdar û rêberekî leheng wekî Dr. Seîd û desteyek ji xebatkarên partiya me ji bo tevgera rizgarîxwaziya Kurd bi giştî û nemaze PDK Îranê û malbatên wan ên welatparêz ziyan û xisareke mezin û jibîrnekirî ye. Ev kiryara terorîstî bi qasekê dilêş bû ku civata navneteweyî hejand. Lewra ji hêla kom û komeleyên siyasî û mirovhez ve hate şermezarkirin û daxwaza vekolîn û lêpirsîn li ser awayê vê kiryara terorîstî û herwiha cezakirina tawanbarên vê cinayetê ji dewleta Almanya û dezgeh û saziyên ewlekarî û dadê ên wî welatî kirin.

Polîsê Almanya jî bi lezginî dest da tekoşînê û di demeke kurt de karî bikujên cinayeta terorîstî a Mîkonosê binçav bike. Piştî zêdetir ji 3 sal û nîvan vekolîn li ser sûçbaran, Dezgeha Dadê a Almanyayê gihîşt vê encamê ku terorîst ji aliyê rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve hatine sipartin ku vê cinayetê encam bidin. Biryara Dadgeha Federal a Almanyayê û encama lêkolînan di 23'ê Nîsana 1997'an hate îlankirin û li seranserê cîhanê deng veda. Li pey ev biryara Dadgeha Dadê a Almanyayê, dewleta Almanyayê, Amerîka û her wiha Yekîtiya Ewropayê di civîna Civatên Wezîran de ku di 29.04.1997'an li Lokzamborgê hate lidarxistin, ev tawana rêberên rejîma Îslamî a Îranê hate mehkûmkirin. Piraniya wan welatan balyozên xwe ji Îranê vexwendin û pêwendiyên xwe ên dîplomasiyê bi Îranê re ji bo demekê sekinandin.

**Xûşk û birayên qedirgiran!**

Rejîma Komara Îslamî a Îranê piştî derbasbûna 28 salan ji desthilata reş û gemar a xwe de, nekarî ye ku daxwaziyên siyasî û sivîl ên neteweyên Îranê dabîn bike. Ji bo mana desthilata xwe a dîktator, li ser siyaseta çewisandin û tund û dijwariyê berdewam e. Bi taybet piştî hatine ser kara Mehmûd Ehmedînejad bi tevahî ji bo serkuta hemû dengeke demokrasîxwazane û hemû hewl û bizaveke şoreşvanî û welatparêzane pêleke din ji girtin, îşkence û îdaman dest pê kiriye û girtîxane ji azadîxwaz, rojnamevan û çalakên xebata sivîl tejî kirine. Herwiha rejîm di warê aborî ve jî rastî kirîz û pirsgirêkên kûr bûye û giranî, bêkarî û betalî, qendelî û riziyoka îdarî û civakî yê bûye beşek din ji vê qeyranê.

Di siyaseta navdewletî de jî bi sedema neparastina yasayan û liberçavnegirtina rêsayên navneteweyî û çaresernekirina projekta Etomî û alîkarî bi terorîzma navdewletî re û polîtîka maytêkirin û destavêtin di nav kar û barên welatan de, bi tevahî di nav û kom û komeleyên siyasî û navneteweyî de munzewî bûye û bawerî û hitbara xwe li cem welatên pêşverû û mirovdost ji dest daye.

**Hevalên hêja!**

Em di çaxekê de 15 saliya şehîdbûna rêberê mezin yê partiya xwe Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî bibîr tînin ku di seranserê cîhanê de û nemaze li Rojhilata Navîn xebateke tund û dijwar li dijî terorîzm û dîktatoriyê didome û rojane sedan kes dibin goriyên destê teorîzmê.

Eva di demekê de ye ku niha basê vê çendê tê kirin ku Dezgeha Dad a Almanya dixwaze çend kes ji bikujên cinayeta Mîkonosê di dawiya îsal de serbest berde û bişînin welatên wan. Em bawer in ku kiryareke wiha ji bilî bêhurmet bi nirx û û pirensîpên mirovahiyê û binpêkirina mafên mirovan tu peyameke din di dû de tune, lewra em daxwaz dikin ku rê û derfeta serbestberdana van tawanbarane nehê dayîn û hewl û xebata vê yekê jî were dan ku rêberên rejîma teror û tawanê a Komara Îslamî a Îranê jî wekî biryarderên vê cinayeta terorîstî di dadgeheke navneteweyî de bi cezayên xwe bigihîjin.

**Beşdarên rêzdar!**

Di rastî de bibîranîna Dr. Şerefkendî û hevalên wî ên nemir, tenê yadek nine ku di roja 17'ê Îlonê de were rêzgirtin. Belkî bîranîn û serpêhatiyên wan hevgav di nav dilê tev Kurdek welatparêz de zindî ne. Xebat û tekoşîna tejî destkevt û serfirazî, exlaq û sincê bilind yê şoreşvanî yê wan, rêbaza herdem zindî ya wan sermeşq û mînakek bêwêne a xebata me ye û em şanazî û rûmetê bi wan dikin.

Her wekî em mêze dikin gelê xebatkar yê Kurdistanê û keç û xortên wefadar ên neteweya Kurd û gişt hogirên azadî û demokrasiyê jî li seranserî dinyayê bîranîna rêberê nemir ê gelê me rêz digirin û xwegorîkirina wan bilind dinirxînin. Her di wê demê de jî kerb û bêzariya xwe ji terorîzmê û rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê wekî biryarderên cinayeta Mîkonosê û sedan kiryarên din ên terorîstî didin xuyakirin û şermezar dikin.

Di 15'hemîn salvegera şehîdbûna rêberê zana Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên nemir Fetah Ebdulî, Humayon Erdelan û Nûrî Dêhkurdî, careke din em tevî canê paqij ê wan soz û peymanê nû dikin heta bidestveanîna armancên wan û gihîştina gelê Kurd bi mafên berheq ên xwe xebat û rêbaza wan a pîroz didomînin û ala armancên wan her bilind û geş radigirin.

**Silav li canê paqij yê Dr. Seîd û hevalên wî**

**Bihiloşe rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî a Îranê**

**Serkeve xebata gelên Îranê ji bo anîne serkara sîstemeke demokratîk û federal di Îranê de**

**Di dawiyê de careke din bona beşdariya we rêzdaran di vê rê û resmê spas dikim.**

## Di Binkeya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê De, 15'hemîn Salvegera Şehîdên Terora Berlînê Hate Bibîranîn



Roja duşem, 17.09.2007'an, di rê û resmek berfireh de bi beşdariya endamên rêberî, Kadro û Pêşmergeyên PDK Îranê, rêz ji bîranîna Şehîdên terora Mîkonosê, **Dr. Sadiq Şerefkendî, Fetah Ebdulî, Humayûn Erdelan** û **Nûrî Dêhkurdî** bi boneya 15'hemîn salvegera terora wan ji aliyê dewleta Komara Îslamî a Îranê hate girtin.

Rê û resm bi xwendina sirûda neteweyî a **Ey Reqîb** û rawestandina deqîqeyek bêdengiyê bona hurmetgirtin ji hemû Şehîdên rêya azadiya Kurd û Kurdistanê dest pê kir. Piştre peyama Deftera Siyasî a PDK Îranê bi vê boneyê ji aliyê rêzdar **Mihemednezîf Qadirî**, endamê Polîtbîroya partiyê hate pêşkêşkirin. Di peyama Deftera Siyasî de, Mihemednezîf Qadirî tevî lênihêrînek ji çawaniya bûyera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî, bi kurtî li ser jiyan, xebat û kesayetiya Dr. Şerefkendî, kekê Fetah Ebdulî, Humayûn Erdelan û Nûrî Dêhkurdî sekinî û herwiha beşek ji taybetmendiyên bilind ên Dr. Şerefkendî anîn berbas.

Piştre li ser terora han û pêkhatina Dadgeha Mîkonosê bal hatibû kişandin.

Di dawiya peyama Deftera Siyasî ya PDK Îranê bi boneya 15'hemîn salvegera Berlînê ji aliyê Komara Îslamî, tevî îşarekirin bi serbestberdana yek ji rêveberên terorê ji aliyê dewleta Almanyayê, daxwaz hatibû kirin ku dewleta Almanya xwe ji vî karî biparêze.

Di beşek din ya rê û resma rêzgirtin ji bîranîna Şehîdên terora Berlînê, peyama hevbeş ya Yekîtiya Jinan, Yekîtiya Ciwanan û Yekîtiya Xwendkarên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê **Hejar Rehîmî** ve hate xwendin.

Di beşên din ên rê û resma bibîranîna 15'hemîn salroja terora hov a Mîkonosa Berlînê de, çend sirûd, helbest, pexşan û wd... taybet ji bo vê boneyê hatin pêşkêşkirin

www.arsivakurd.org

# Bîranînek Ji Cinayeta Agirberdana Gundên Bajarê Makûyê

**Mecîd Cinîkanlû**

Heke em lênihêrîneke bi ser dîroka xebata azadîxwaziya neteweya Kurd bikin, gellek xuya û eşkere ji me re derdikeve ku desthilat ên dagirker ên Kurdistanê ji tu zulm, zordarî, kuştin û cinayetekê li dijî neteweya bindest û belengaz a Kurd xwe neparastine. Wan dewletan herdem û aliyê kêm ji sed salan berî niha ve, ji heyîn û çavkaniyên aborî ên axa Kurdistanê çek û sîlah kirîne û bi wan çekan Kurd kuştine û gellek nimûneyên komkujiyên biçûk û mezin encam dane.

Heta duh rejîma Faşîst a Beesê bi serkêşiya Sedamê dîktator bi bombeyên Kîmyayî li Helebçeyê 5000 mirovên sivîl kuştin û cinayeta Enfalê afirand, li Turkiyê hikûmeta nejadperest a wî welatî di çarçoveya siyaseta Kemalîstî a înkara Kurdan, Kurd bi Turkên Kovî binav dikirin û şoreşên Kurdan qir dikirin û zimanê Kurdî qedexe dikirin, li Sûriyê jî rejîma dîktator a wî welatî hêj Kurd bê nasname hêlane û zext û îşkence û kuştin ji bo Kurdên vî parçeyî vê bûye edeteke rojane a jiyana wan, li Îranê jî Kurdkujî, asîmîlasyon û kuştin û terorkirina rêber û keç û xortên welatparêz û azadîxwaz ên vî parçeyî her berdewam bûye û her du rejîmên Şahenşahî û Komara Îslamî ji tu cinayetekê li dijî Kurdan parêzî nekirin û nakin, lê tevgera rizgarîxwaz ya Kurd her di çepera heqxwaziyê de maye û xebata Kurdan bona bidestxistina mafên neteweyî li hemû beşên Kurdistanê ne rawestaye. Bi xweşî ve 15 sal e Kurdistana Başûr azadî wergirtiye û Hikûmeta Herêma Kurdistanê ava bûye.

Di vê nivîsarê em dê lênihêrînekê bi ser cinayeta agirberdana gundeke bajarê Makûyê bikin. Di dema sed salên derbasbûyî de sîstemên Paşatî û Komara Îslamî, ji ber mafxwaziya Kurdan li Îranê, neteweya me herdem ketiye ber êrîş û xezeba wan du desthilatên zordar û Kurdkuj. Rejîma Pehlewî bi qirkirina şoreşa Simkoyê Şikak û hiloşandina Komara Demokratîk a Kurdistanê li bajarê Mehabadê û îdama rêberên Komarê û kuştin, dûrxistin û wd... ji tu kiryareke cinayetkarane xwe neparast.

Piştî nemana rejîma dîktator a Pehlewî û serketina Şoreşa Gelên Îranê di sala 1979'an, hemû gelên Îranê bi vê hêvî û xweziyê bûn ku tevî bidestvegirtina desthilatê ji aliyê rejîma taze hatî a Komara Îslamî dê bikarin mafên neteweyî, hiqûq û azadiyên mirovî ên xwe bidest bixin. Lê rejîma Melayan bi serkêşiya Xomeynî ji rojên destpêka serketina şoreşê bi êrîşa ser neteweyên Îranê li Turkmen Sehra, Belûçistan û Kurdistanê naverok û kakila cinayetkarane a xwe bi xelkê Îranê û nemaze neteweyên bindest ên Îranê nîşan da. Hevdem tevî îlankirina xebata eşkere ya PDK Îranê di 11'ê Reşemeya 1358(1980)'an, Partiya Demokrat bi piştevaniya civatên xelkê Kurdistanê ji bo bidestveanîna mafên neteweyî ên gelê Kurd di çarçoveya Îranê hewl da ji rêya gotûbêj û diyalogê bi hikûmeta navendî re daxwaz û xwestekê rewa û dêrîn ên Kurd bîne cî. Lê Xomeynî bi dana Fetwayê li dijî neteweya Kurd di 28'ê Gelawêja 1358(1980)'an de, bersiva banga aştiyane û azadîxwaza Kurdan bi guleyan da. Di vê pêvajoyê de xortên



Wêneyek ji gundê Yarmiqê

gelê Kurd li seranserî Kurdistanê û di vê navberê de bajarê Makû û derdorê jî bi piştgiriya bernameyên neteweyî û mirovhezane yên PDK Îranê rabûn. Ji ber ku ev bajarê Kurdistanê herdem melbenda şoreş û bizavên neteweyî ên Kurdan bûye û zanyariyên bêtir li ser tevgerên Kurdan hebûn û pir caran hatibûn mişextî, koçberkirin û dûrxistin. Xelkê Kurd yê vê navçeyê di salên 1930'an, roleke çeleng û ektîv li serhildan û alîkariya Şoreşa Agirî bi rêberiya Partiya Xoybûn û Êhsan Nûrî Paşa re hebûn.

Di vê rêyê de şehîdên wekî **Ferzinde Celalî** diyarî rêbaza azadî û rizgariya Kurdistanê kiribûn. Piştî serkut û qirkirina vê şoreşa bi hevkariya Turkiyê û Îranê, bêtirî 165 gundên vê deverê di nav axa Îran û Turkiyê de bi tevahî hatin kavilkirin û ji nav çûn û nêzîk 200 malbatên Kurd ên Makûyê ji bajarê Qezvîna Îranê re hatin dûrxistin, sirgûnkirin. Di dema Şoreşa Agirî de û piştî serkutkirina vê şoreşê, çiyayê Agiriyê biçûk li hember çend sed metr erdî li herêma Sêroyê, di navbera van du rejîman hate guhertin. Serbarê vana hemûyan, serpêhatiya parçekirina Kurdistanê bi du parçeyan bo cara yekemîn di deşta Çaldirana Makûyê, hêj di lavik û kilamên jin û mêrên vê navçeyî de, xem û kula giran a parvekirina axa Kurdistanê ye. Ji ber vê sedemê xelkê Kurd yê vê herêmê di destpêka şoreşa Gelên Îranê wekî her derekî Kurdistanê ji bo parastin û berevanî ji armancên neteweya Kurd amade bûn. Lewra her di rojên destpêka şoreşê de bi sedan ciwanên vê devera Kurdistana Rojhilat ji bo bidestxistina maf û azadiyên berheq û demokratîk ên gelê Kurd tevlî refên Pêşmergeyên PDK Îranê bûn. Roja 14'ê Xezelverê sala 1360'an a Rojî(6'ê Ciriya Pêşîn a sala 1981)'an, hêzên Sipaha Pasdaran a Komara Îslamî a Îranê êrîşeke berfireh kirin ser gundên bajarê Makûyê û cuda ji wêran û xirakirina dehan xanî û malên gundiyên deverê û kuştina xelkê sivîl, gundê **Yarmiqa Jêrîn** bi tevahî şewitandin. Piştî agirberdana gund, sedan ser ji ajel û heywanên xelkê vî gundê ji nav birin. Herwiha du kes bi navên: **Îsmayîl Ramî** û **Hesen Direxşanî** kuştin û jinek bi navê **Besê Şehnazî** bi xurtî birîndar bû û xelkê din ên vî gundî neçar man cî û warê xwe biterikînin. Hevdem tevî vê êrîşa Pasdarên Xomeynî çendîn xaniyên gundê **Xerman**ê bi destê wan xirab bûn ku tenê tawana xelkê vî gundî piştevanî ji armanc û mafên neteweyî bi rêberiya PDK Îranê û xwedîkirina Pêşmergeyan bû. Hemû ev bûyer di çarçoveya fermana cîhada Xomeynî li dijî xelkê Kurdistanê bûn, fetwa û fermanek nemirovane ku heya îro jî her didome û her rojê jiyana çend welatiyên Kurd distîne.

Rejîma cinayet û gemar a Komara Îslamî wisa difikire ku bi kuştin, îdam, îşkence, dûrxistin, kavilkirin û wd...ya Kurdan û cî warê wan, dê bikare neteweya Kurd neçar bike dest ji bizav û xebatê berdin, lê cinayetên han û heta terorkirina rêberên mezin û navdar xebata azadîxwziya Kurd li Kurdistana Îranê wek Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî û wd... nekarî Kurdan rastî têkçûnê bîne û wan di rêbaza bidestxistina maf û azadiyên neteweyî dilsar bike. Belkî ev hemû serkut, qirkirin û zordarî pêvajoya serhildan û nîşandana nerazîbûna xelkê Kurd û domandina rêya rêberên şehîd germ û gurr û mikumtir kiriye û bêguman ev xebate heya roja serbestiyê dê her bidome.

Di 26'mîn salvegera cinayeta agirberdan û kavilkirina gundê Yarmiqa Jêrîn a ser bi bajarê Makûyê, em tevî mehkûmkirina wê cinayeta hov, şehîd û qoriyên din ên vê cinayetê bibîr tînin.

www.arsivakurd.org

# Çalakiyên Rêzgirtin Ji 15'hemîn Salvegera Şehîdkirina Dr. Şerefkendî Û Hevalên Wî

## *Li Hundirê Welat 15'hemîn Salvegera Şehîdên Mîkonosê Hate Bibîranîn*



Xelkê gund û bajarên cur bi cur ên Kurdistana Îranê bi boneya 15'hemîn salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî, li ser bangewaza Komîsyona Rêxistina Nepenî ya PDK Îranê, serdana malbatên şehîdan û mezarên pîroz yên şehîdan kirin.

Herwiha bi vê boneyê li piraniya gund û bajarê Kurdistanê de çalakiyên bibîranînê di astekî berfireh de hatin lidarxistin.

**Bi Beşdariya Sedan Kes Ji Akinciyên Ewropa Û Nûnerên Partî Û Rêxistinên Kurdistanî Û Îranî**

## Li Goristana Pîrlaşêzê 15'hemîn Salvegera Şehîdên Mîkonosê Hate Bibîranîn




Bi sedan kes ji Kurdên akincî ên Ewropa bi beşdariyeke berçav, şehîdên Mîkonosê hatin bibîranîn. Roja yekşem, 16.09.2007'an, endam û alîgirên PDK Îranê ji çend welatên Ewropayî ve ji bo beşdarîkirin di wê rê û resmê de civiyan. Di wê rê û resmê de ku birêz **Xusro Ebdulahî**, berpirsê Pêwendiyên Navneteweyî ên Partiyê ve dest pê kir, birêz **Hesen Şerefî** Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di gotarekê de, tevî bibîranîna goriyên terora Komara Îslamî a Îranê, beşdariya Kurd û Îranî û biyaniyan di vê rê û resmê de ji aliyekê nîşaneya derbirîna bêzariyê ji terorîzma Komara Îslamî û mehkûmkirina teror û terorîzmê û ji aliyeke din ve nîşaneya rêzgirtin û emegdarî bi rêbaza rêberên şehîd hesiband. Rêzdar Hesen Şerefî di doma axavtina xwe de tevî baskirin ji taybetmendiyên Dr. Şerefkendî, sedemên terorkirina wî ji aliyê Komara Îslamî anîn berbas. Di beşeke din a axavtinên xwe de birêz Şerefî tevî dubarekirina siyaset û pirensîpên neteweyî û demokratîk ên PDK Îranê, di wê rojê de daxwaz ji xelkê Kurdistanê kir ku di pêxema gihîştin bi armancên rêberên şehîd de, beşdariyeke çalaktir di xebata neteweyî a gelê Kurd de bikin.

Di rê û resma han de Pirofesor **Dr. Kendal Nezan** Serokê Enistîtuya Kurd ya Parîsê, nûnerê Rêxistina Bijîşkên Bêsînor, nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, nûnerê Rêxistina Çirîkên Fedayî(Piranî), nûnerên partî û rêxistinên din ên Kurdistanî peyam û gotar xwendin.

Hêjayî gotinê ye ku hejmarek berfireh ji endam û alîgirên PDK Îranê ji gellek welatên Ewropayê tevlî rê û resma bibîranîna han bûn û soz û peyama xwe tevî şehîdên Mîkonosê nû kirin.

## Li Stokholmê 15'hemîn Salvegera Şehîdên Mîkonosê Hate Bibîranîn

Komîteya PDK Îranê bi alîkariya Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê, rê û rema 15'hemîn salroja şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî li bajarê Stokholm a Swêdê bi beşdariya nêzîk 300 kesan hate lidarxistin.

Roja şemî, 15.09.2007'an, rê û resma 15'hemîn salvegera terorkirina nemirovane a Dr. Sadiq Şerefkendî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, kekê Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê wê demê yê partiyê li derveyî welat, Humayûn Erdelan, berpirsê Komîteya PDK Îranê li Almaniyayê û Nûrî Dêhkurdî, dostê partiyê li bajarê Stokholmê hate lidarxistin. Destpêka bernameyê bi ragirtina deqîqeyekê bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij yê şehîdan dest pê kir, piştre ji aliyê rêveberê bernameyê **Aso Seyad** çend beş ji gotinên Dr. Sadiq hate xwendin. Piştre ji aliyê YCDK Îranê ve kurteşanoyek ji aliyê **Cemal Qeytulî** û sirûdek di bin navê **Berxwdan** ji amadekirina **Aram Ebdulayî** hate pêşkêşkirin.

Di doma rê û resmê de çendîn partî û kesayetiyên siyasî gotar û peyam xwendin ku bi vî awayî bûn:

1- Peyama Komîteya Swêdê a PDK Îranê ji aliyê Qasim Qehremanî

2- Peyama Komîteya Alîkariya Hêzên Siyasî ên Kurd û Kurdistanî ji aliyê Elî Zendî

3- Peyama Kongireya Neteweyên Îrana Federal, tayê Stokholmê ji aliyê Mihemed Zeynedîn

4- Pêşkêşkirina gotarekê li ser **rola Dr. Şerefkendî di PDK Îranê de** ji aliyê rêzdar Babaelî Mêhrperwer ve

5- Peyama Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê Xatûna Mestûre Sultanî

6- Pêşkêşkirina gotarekê di bin navê **raman siyasî û cîhanbîniya Dr. Sadiq de**, ji aliyê Kemal Mecîdpûr, çalakê siyasî

7- Peyama Federasyona Komeleyên Kurdistanî li Swêdê ji aliyê Selam Cizîrî

8- Pêşkêşkirina gotarekê di bin navê **serxwebûna siyasî ya Şehîd Dr. Seîd de**, ji aliyê Ebdulriza Kerîmî, Ravêjkarê Komîteya Navendî ya PDK Îranê

Di wê rê û resmê de ev peyamane jî gihîştibûn:

1. Komîteya Pêşmergeyên Dêrîn ên Kurdistanê, tayê derve

2. Peyama Herêma 3 a Federasyona Komeleyên Kurdistanî

3. Peyama Partiya Demokrat a Kurdistan – Bakur, tayê Swêdê

Di beşa dawî a wê rê û resmê de, ji aliyê **Mistefa Zareî** bi nûneriya Komîteya Swêdê a PDK Îranê ve, destegulek emegdarî û wefadariyê ji xûşka **Cemîle Hesenxalî**, keseke nêzîk malbata Dr. Sadiq Şerefkendî re hate pêşkêşkirin.

Her wiha destegulek bi nîşana qedirzanînê ji kekê **Mutelib** weke hevşagirdê Dr. Seîd hate pêşkêşkirin.

**Selam Cizîrî** helbetsek ku ji bo Dr. Seîd nivîsandibû, xwend. Piştre **Qemer Xusrewî** û **Şahîn** du sirûd pêşkêş kirin. Rê û resma rêzgirtin ji bibîranîna şehîdên terora Mîkonsonê, li Stokholmê bi xwendina sirûda **Ey Şehîdan** dawî pê hat

**Rapora: Komîteya Swêdê a PDK Îranê**

# Daristanên Çend Bajarên Kurdistana Îranê Hatin Şewitandin

*Heyamek dibe ku agir ji daristanên çend bajarên Kurdistana Îranê tê berdan û xwezaya bedew û delal ya Kurdistanê tê jinavbirin. Hate eşkerekirin ku hêzên ser bi Komara Îslamî agir berdidin daristanên Kurdistanê. Li jê em dê nûçeyên herî nêzîk bixin pêşberi we xwendevanên hêja:*

**Hêzên Rejîmê Agir Berdane Daristanên Hewramanê**

Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê da zanîn ku heyamekê berî niha du kes ji kirêgirtiyên rejîmê agir berdane daristanên devera bajarê Pawe û devera Hewramanê.

Li gor gotinên şahîdên amade di vê bûyerê de, daristanên Hewramanê, rasterast ji aliyê kirêgirtiyên rejîmê ve hatin şewitandin.

Piştî ku çend caran daristanên han hatin şewitandin û xelk li dû rêveberên vê kiryarê digeriyan, eşkere bû ku 2 kes ji kirêgirtiyên Ewlekariya Komara Îslamî ku otombêleke sipî hebûn, agir berdane daristanên Pawe û Hewramanê. Xelkê kesên han di dema agirberdana daristanan dîtine.

Hêjayî gotinê ye ku seba şewitîna daristanên Hewramanê, gellek cotkar û pezdarên vê deverê tûşî zirar û ziyanên giran hatine û ekosîstema vê deverê jî rastî zaf ziyan û xisarên berfireh hatiye.



*Wêne: Agirberdana daristanên bajarê Pawe ji aliyê hêzên Komara Îslamî ya Îranê ve*


**Daristanên Dizlê Jî Hatin Şewitandin**

Herwiha hejmarek ji kirêgirtiyên rejîmê hefîteya derbasnûyî, agir berdan daristanên çiyayên pişt gndê Dizlê ser bi bajarê Merîwanê.

Piştî agedarbûn ji vê kiryarê, xelkê hewlên xwe bona destpêkirina agir dan, lê Besîciyên rejîmê ji bo berlêgirtin ji vemirandina agirê han, rêya wî karî ji xelkê girtin û pevçûn derdket holê. Hêjayî gotinê ye xelkê gundê Dizlê bê guhdan bi gefxwerinên kirêgirtiyên rejîmê û piştî pevçûna bi wan re , agirê ku li daristanên gundê Dizlê hatibû berdan, temirandin.

Hêjayê gotinê ye ku di çend rojên borî de daristanên derdora bajarê Ciwanroyê û daristanên çend bajarên din yên Kurdistanê jî hatine şewitandin.

# Li Navenda 3 Ya Kurdistanê 15'hemîn Salvegera Terorkirina Dr. Şerefkendî Û Hevalên Wî Hate Bibîranîn



Roja duşem, 17.09.2007'an, bi boneya 15'hemîn salvegera terora li dijî Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî ji aliyê Komara Îslamî ve, civîneke bibîranînê li Navenda 3 ya Kurdistanê bi beşdariya berpirsyarên Navenda 3 ya Kurdistanê û Kadro, Pêşmerge û malbatên wê Navendê hate lidarxistin.

Di vê civîna bibîranînê de, hevalên **Qasim Keleşî, Sidîq Derwîşî** û **Kemal Xizrî** li ser kesayetî û taybetmendiyên Dr. Şerefkendî û rol girîng a wî di PDK Îranê de gotar pêşkêş kirin.

Piştre çend sirûd, pexşan û helbestên taybet bi vê boneyê hatin xwendin.

Di beşa dawî a civîna bibîranîna 15'hemîn salroja terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî de, li Navenda 3 ya Kurdistanê 34 berg ji pirtûka **Albuma Şehîdan** pêşkêşî 34 malbatên Şehîdên serbilind ên rêya azadiyê hatin kirin.

# Îranê Sînorên Xwe Li Ser Herêma Kurdistanê Girtin

**Rapor/ Azad Kurdî**

Roja duşem, 24'ê Îlona 2007'an, Komara Îslamî a Îranê bi awayekî fermî 5 sînorên xwe ên bazirganiyê bi Herêma Kurdistana Îraqê re girtin.

Ev kiryara rejîma Îslamî a Îranê ji bo nerazîbûn li hember girtina kesekî Îranî bi navê **Mehmûd Ferhadî** derket holê ku roja pêncşem, 20.09.2007'an, li Hotel Palas a Silêmaniyê ji aliyê hêzên Amerîkî ve hate girtin.

Arteşa Amerîkayiyan da zanîn ku Mehmûd Ferhadî yek ji endam û berpirsiyarên bilind yê Sipaha Quds di Îraqê de ye ku bi dizî ve û ji rêya ne qanûnî bombeyên xurt û bixeter ku li ser rêyan tê bikaranîn, tîne Îraqê û her wiha terorîst û hêzên tundrew ên biyanî perwerde dike û ji Îraqê re dişîne.

Rayedarên Komara Îslamî dibêjin ku Ferhadî Ravêjkarê Bazirganiyê yê Parêzgarê Kirmaşanê ye û her wiha berpirsiyarê ticareta sînorî ya Parêzgariya Kirmaşanê ye ku ev îdeaya berevajî gotin û helwesta Amerîkayiyan li ser vî kesî diselimîne.

Di daxuyaniya piştî girtina Ferhadî li Silêmaniyê, Pentagonê diyar kir ku kesê girtî heftemîn berpirsiyarê bilind yê hêza Qudsê ye ku li Îraqê hatiye girtin. Her wek tê zanîn di meha yekem a sala 2007'an de, hêzên Amerîkayî li bajarê Hewlêrê jî avêtin ser navendeke sîxor û ajanê a Komara Îslamî a Îranê û 5 kes girtin ku heya niha jî di destê hêzên Amerîkayî de ne.

Gellek karnasên aborî û siyasetvan li ser vê baweriyê ne ku daxistina sînorên Helebçe, Xaneqîn, Başmax, Pêncvîn û Hacî Omeranê ji aliyê Komara Îslamî a Îranê li ser Herêma Kurdistanê dorpêçkirina aborî yên xurt pêk bîne. Girtina sînoran bi Herêma Kurdistanê re çiqas ziyan û zextê bîne ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê, bi wê radeyê jî ziyan û zirarê dide şirket û kompaniyên Îranê ku bi Herêma Kurdistanê re alvêr û dan û standinê dikin.

Tê gotin nêzîk 120 şirketên mezin yên Îranî li Kurdistanê dixebitin ku piraniya wan di warê xanîçêkirinê de kar dikin. Piraniya şirketên Îranî ser bi hêzên Ewlekarî, Sipaha Pasdaran û saziyên din ên dewletî ên Îranê ne, lê ji ber hevtixûbbûna 4 parêzgehên Kurdistana Îranê tevî Herêma Kurdistanê alvêr û kirîn û firotineke berfireh bi Kurdistana Îraqê re di navbera her du aliyan de heye ku bêguman girtina sînoran zextê dixe ser her du beşên Kurdistanê.

Li pişt perdê vê kiryara Komara Îslamî a Îranê, gellek armanc û meremên taybetî ên din veşartî ne. Ji aliyekê dewleta Îranê bi vî karî dixwaze baykot û tengasiyên zêdetir bixer ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê û hikûmeta Kurdî jar û lawaz bike. Ji aliyê din Hikûmeta Kurdistanê û Amerîkayê berde hev û alozî û nakokiyan di navbera wan de çê bike. Her wiha Îranê bi vî karî dixwaze zext û givaşê bîne ser partî û rêxistinên azadîxwaz ên Kurdistana Îranê ku li Kurdistana Başûr niştecih in.

Hêjayî gotinê ye ku hêzên Sipaha Qudsê yên ser bi Sipaha Pasdaran a Komara Îslamî bi destavêtin di nav kar û barên hundirê Îraqê weke şandina çek, sîla û bombeyan ji terrorîst û neyarên Hikûmeta Îraqê re, piştevanî û perwerdekirina terorîstan û hatin bo nava axa Îraqê û wd... berdewam ji aliyê Amerîkayiyan tê rexnekirin. Amerîkayiyan bi dehan caran bi belge û dukomentan xebat û çalakiyên Sipaha Quds li Îraqê kifş û eşkere kirine û pirr caran jî hişyarî dane rayedarên Îranê. Mehmûd Ferhadî yek ji berpirsiyarên hêza Qudsê ye û girtina wî di çarçoveya çalakiyên vê hêza têkder di Îraqê de ye.

www.arsivakurd.org

# Hevpeyvîn Bi Xatûna Kejal Hacîebasî, Hevjîna Şehîd Fetah Ebdulî Re

**Hevpeyvîn: Rehîm Reşîdî**
**Wergerandin/ Omîd Esxeran**

**Xatûna Kejal, em spasiya we dikin bona beşdarîkirin di vê hevpeyvînê de.**

Ez jî spasiya we dikim bona vê çendê ku we derfet da min ku li ser bûyera Mîkonosê biaxivim.

**Bila em ji vê pirsiyarê ve dest pê bikin ku gelo nûçeya şehîdbûna Dr. Şerefkendî û hevalên wî çawa gihîşte we?**

Panzdeh salan berî niha di roja 26.06.1371(17.09.1992)'an, demjimêr 11'ê şevê, dengê telefonê ez ji xewê şiyar kirim. Ez recifîm, kêmtir ji deqîqeyekê hemû ew bîranînên tal û nexweş ku jiyanekê dihejîne, ji ber çavên min de derbas bûn. Tu bêjî eva neqewimî be ku ez hertim jê ditirsiyam? Çunku hevjînê min di seferê de bû, seferek ku gellek caran bê vê çendê ku min karîna eşkerekirina vê hebe, min jê ve bû ku dê bêvegerîn be. Mixabin her eva bû ku ji mêj ve bû ez jê ditirsiyam.


Li sirgûnê, li xerîbiyê, dûr ji malbat û kes û karan, di nav dilê welatekê de ku tewr(heta) min zimanê wê jî fam nedikir, bi xwe û zarokekî 5 salî, ji nişkî ve kela xweziyên min herifî û min xwe tenê dît. Me ku hetanî duh di bin sîbera wî de hest bi taliya jiyanê nedikir û min jê ve bû ez jina herî bextewer im, di demeke kurt de em bêderfet man û tarîtî bi ser jiyana me de zal bû.

Ew telefona biyom hilgirê wê peyamê bû "di zûtirîn dem de, xwe bigehîne defterê, kes namaye". Derfeta axavtinê tune bû, kî nemaye? Çi qewimî ye? Li kuderê? Çawa? Kengî? Tu kesek nebû ku bersiva pirsiyarên min bide. Telefon qut bû, tenê li ber serê xweştiviyê xwe ku di xewa kûr a zarokiyê de bû, ez dilerizîm û min rondik dibarandin, rabe zarokê min ê xweştivî, rabe xweştiviyê min, divêt em herin, dibêjin.... dibêjin ku babê te birîndar bûye!!!

Kurê min fam nekir ku ez çi dibêjim, çima nîvşev ji xewê rabe û here ciheke din, nedizanî ku ji bo çi dayîka wî hêsiran dibarîne û dil bi xem e? Wî ku heya wê demê dayîka xwe bi vî awayî nedîtibû, mat û heyrî mabû, hest bi pêşroja jiyanê nedikir, hay ji vê xema giran nebû ku çend biêşe û tu caran ew birîne çê nabe. Bi her awayekê be min têgihîjand ku çi qewimî ye, her di wê demê de min hewl dida ku biwêrek bim, qurs û qahîm bim, dilxweşiyê bidmê, wî biparêzim, jê re bibêjim ku tu caran ez wî bi tenê nahêlim, bêjmê ku ew tenê zarokekî bê bab ê Kurd nine, bi hezaran wekî wî ji tama jiyanê tevî babên xwe bêpar in, bes nine ku wî şansê vê çendê hebû ku li ciheke dijiya ku jiyan bê mana nine, lê bi hezaran zarokên weke wî hene ku ji derfet û şansê han bêpar in. Çûm bo defterê û bi tevahî ji wî bûyera dilêşîn digihîştim.

**Gelo kengî we kekê Fetah Ebdulî nasî û li kuderê we jiyana hevbeş pêk anî?**

Min şehîd Fetah li serdemê nûciwaniyê ve dinasî, piştre jî li dema xortîtiyê de, ji ber ku di xwendingehê de gellek zîrek bû û her wiha di têkilî tevî genc û ciwanên tax de, weke kesekî serbixwe hatibû nasîn. Min jî wê demê tenê ji ber nav û bejnê ew dinasî, piştre ji ber xebata min di şaneyeke partiyê de ku ji aliyê rejîmê ve hate eşkerekirin, ez neçar mam bajar bi cî bihêlim û herim çiya, ligel Fetah nasiyar bûm ku ew jî hatibû nava refên PDK Îranê, di warê fikrî ve ez gellek nêzî Fetah bûm û bas û nîqaş tevî wî ku mirovekî rewşenbîr bû, pir xweş û hêsan bû. Xalên me ên hevbeş gellek bûn, me ji hev fam dikir, mirovekî gellek vekirî bû, baweriyeke zaf bi wekheviya jin û mêran hebû, ji hev famkirina han hêd hêdî warê ji hev hezkirinê di nav me de bihêz kir, me soz da hev ku jiyana hevbeş pêk bînin, di bihara sala 1364(1985)'an de, em bûne dezgîran û her di 3'ê Befranbara wê salê de, piştî bidawî hatina kongireya 7'em a partiyê li Gewredê a Kurdistana Başûr, me govend lidarxist û em zewicîn.



Şehîd Fetah Ebdulî - Kejal Hacîebasî
(hevsera wî)

**Dikarî ji me re qala hinek taybetmendiyên kekê Fetah Ebdulî di birêvebirina kar û barên partiyê de, bikî?**

Şehîd Fetah ew xortê Kurd bû ku bi xwe, xwe pêgihandibû, kurek ku ji malbateke cotkar de mezin bibû, lê ji ber hişyarî û kêrhatîbûnek ku wî hebû, di demeke kurt de karî pileyên herî bilind ên rêxistinî derbas bike û berpirsiyariyên girîng li stû bigire.

Fetah kesek bû ku baweriyeke kûr bi fêrbûn û xwepêgihandinê hebû, bawerî bi diyalogê hebû, alîgirê mentiqê bû, kesek bû ku bê lêfikirîn tu caran biryar nedigirt. Tevî hevalên xwe dişêwirî, baweriyeke berfireh bi kar û şêwirîna bikom hebû, di biryardanê de lezgîn nebû, biryar biryara bikom bû, di dema tengaaiyê de liserxwe bû, hêdî û hêmin, lê micid bû, ji derbirîna bîr û rayên xwe tu tirsek nebû, pişta biryarên xwe digirt, heke biryarên han metirsî jî heban. Fetah hogirê xwendinnê bû, ji hemû derfetekê bona perwerdebûna xwe û jordebirina pileya zaniyariyên xwe mifah distand, ligel hemû destkutiyek ku em li çiya tevî wê berbirû bûn, Fetah hewl dida ku ji xwendin û haydarbûn ji bûyer û nûçeyên herêm û cîhanê bi cî nemîne. Heke hewce ba bi belgeyan diaxivî, cehd dikir ku hemû aliyan dahûrîne, bê vekolîn û bê belgeyên rastî û kemilî biryara yekcarî nedigirt û kes tawanbar nedikir.

Alîgirê rastîn ê hizra ciwan û jinan bû, heke seh kiriba ku yekê karîna geşekirinê heye, dikare xwe pêbigihîne û li pêşerojê dê qazanc bo tevger û partiyê hebe, pişta wî/ê digirt û hevkariya wî/ê dikir. Her çend ku temenê Fetah kêm bû, lê her bi wî temenê kêm di nava dilê pîr û ciwanan û gişt aliyekê de ciyê xwe vekiribû, Fetah kêm diaxivî, lê heke hewce ba hemû derfeta xwe ji bo rohnkirin û bersivandina pirsiyaran terxan dikir. Wî karî di demeke kurt de bibe ciyê baweriya gişt wan xelkên ku di deverên bin berpirsiyariya wî de dijiyan û bibû peyva ser zimanê xelkê.

Fetah demnas bû, ji bo wî dem pir pûtedar bû, dem ji dest nedida, tim hewl dida ku xwe hîn bike, ligel vê çendê ku ew tewaya rojê mijûlî encamdana kar û barên partiyê, hevdîtin, seferkirin û û cîbicîkirina erkan bû, dema ku dihat bo malê, 2 heya 3 demjimêran mijûlî fêrbûna zimanê Fransayî û şopandina nûçeyên bi zimanê Fransayî bû.

Heke demjimêr 1'ê nîvşe jî vegeriyaba malê, diviya ew 2 heya 3 demjimêrên ku wî ji bo fêrbûna ziman terxan kiribû, biencam gihandiba. Her ew xwemandîkirine bû ku wî karî li heyama kêmtir ji 6 mehan bikare bi zimanê Fransayî biaxive û di kom û civatan de bê wergêr bikare beşdariyê bike.

Fetah li wê heyama kurt li derveyî welat jî bi dostên partiyê, çi Kurd, çi Îranî û çi biyaniyanî re nîşan da ku mirovekî xwedî şiyan û karîn e, bi fikr û afirîner e, wî nîşan da ku guhdarê gişt pêşniyar û rexneyên hemû aliyekê ye, lê wî eva jî dizanî ku bê hevkariya bikom serkevtin bidestve nahê. Fetah gellek bi zûyî taybetmendî û karînên xwe derxist û ciyê xwe di nav kom û civatan de vekir.

Caneke nû da rêxistina partiyê li derveyî welat, karê bi komel û berpirsiyariyên giştî kire şêwaza(modela) xebata partiyê, buhadan bi ciwanan kire **BAW**, bîr û ra diguherîn, berpirsekî jêhat û her di wê demê de jî afirîner bû. Wazwazîtî nedikir, tevî hevalên xwe rast û dirust bû. Tu tiştek ji bo wî jordetir ji qazanc û berjewendiyên partiyê nebû, lewra rêberên şehîd çi Dr. Qasimlo ku wê demê Fetaf di hundirê Kurdistanê de berpirs bû û çi di dema sekreteriya Dr. Seîd de ku Fetah berpirsê partiyê li derveyî welat bû, bawerî û hitbareke zaf pê hebûn, destê wî di biryardanê de vekirî hêlabûn.

Kekê Seîd şevek berî wê sefera bêvegeriyan di nav komek ji hevalên xwe de got: “ Divêt em bi hemû karîna xwe Fetah biparêzin, çunku ew kesekî ciyê bawerî û hitbara gel û partiyê ye, dê bibe kesek ku di pêşerojê de karîna tejîkirina valahiyên gellek mezin hebe”.

Fetah tu demekê bi pêregotinan jixwe razî nedibû, roj li pey rojê hewl dida ku berbi pêşve biçe û ji bîr, hiz û rabûn û rûniştinên neteweyên pêşkevtî têbigihîje û ligel zirûfa Kurd binirxîne.

**Gelo taybetmendiyên şehîd Fetah di jiyana civakî de çi bûn?**

Fetah çiqas ku di jiyana siyasî de serkevtî bû, her bi wî qasî jî di jiyana civakî de serkevtî bû, dujminê mirovkuj derfet jê re neda ku baştir were nasîn, lê di wê dema kurt de jî nêrîn û ramanên xwe nîşan da.

Fetah pêşengû rêveker bû, bo mînak di yek ji nivîsarên xwe li deftera serpêhatiyên xwe de ku ji wî bi cî maye, hesta paqij a xwe li ser min weke jinekê gellek bi ronî û bedewî xuya kiriye, ji ber ku nivîsara han dirêj e û di vê hevpeyvînê de cî nagire, ez li wir nikarim qala wê bikim.

Fetah bawerî bi **bike** û **neke** tune bû, heke bi xwe bawerî bi tiştekê heba, dikir û ji vê çendê ku li pişt serê wî dê çi bibêjin, tu tirsek nebû, wî digot: “Divêt em guherînê bi ser wê civakê de bînin, heke em ji xwe ve û bixwe dest pê nekin, kes li ciyê me nake”. Ji bo Fetah gellek asayî bû ku hevjîna wî piştî jiyana hevbeş jî her tevî Pêşmergeyan di binkeyên partiyê de ligel hevalên xwe de bimîne û tevî wan bas û nîqaşan bike û li ser sifreyekê rabe û rûnê. Ji bo Fetah asayî bû ku jin bi dilxwaziya xwe ji xwe re heval û hevjînan hilbijêre. Fetah li dijî ew kevneşopa parvemayî a civakê bû ku mêr mafê vê çendê hebe ku çend jinan ji xwe re bixwaze. Di bîra min de ye ku carekê Pêşmergeyeke bi nav û deng ku xwediyê jinek û çend zarokan bû, dixwest ku jineke din bi ser jina xwe a yekem de bîne, Fetah ku hay ji vê çendê bû, ew hevalê Pêşmerge gazî kir û gellek bi rohnî jêre got ku heke kiryareke wiha bike, bê yek û du her çend ku qehreman, bimfah û hizbiyeke pak be, di nav refên partiyê de tu cihek nabe û dê were derêxistin û bi belgeyan gihande qîmê(qenaet) ku ji ber kesayetiya wî Pêşmergeyî nine, belku ew weke berpirsekî partiyê divêt pirensîpa han biparêze.

Heke we Fetah bidîta, we jêve dibû ku mirovekî xwerazî ye, çunku di jiyana xelkê de maytêkirin nedikir û li ser xelk dawerî nedikir, heke kesek nenasîba, gellek bi wî/ê re nediaxivî, lê heke nasîneke kêm jî li ser kesekê/î heba, Fetah hemû tiştek dixist qeraxê û dibû dost û hevalekî dilsoz ê wî/ê kesî/ê, alîgirê xelkê xizan û destkurt bû, piştevanê jina jêqewimî û ciwanê bêderfet bû, mirovdost bi wateya peyvê bû, kesekî nexwerazî û mirovhez bû.

**Bêşik we Dr. Şerefkendî ji nêzîk ve dîtiye û tevî beşek ji nihêrînên wî li derheq mijarên cur bi cur bi taybet pirsgirêka jin nasyar bûn, dikarî di vê derheqê de agahiyan bidî me?**

Mixabin ji bilî wê dema ku ez li Deftera Parîsê bûm û ew sekreterê partiyê bû, ez ji nêzîk ve tevî Dr. Şerefkendî nexebitîme, lê di wê dema kurt de min du nimûne jê dîtin, ji bo min bes bû ku ji nêrîna Dr. Seîd derheq pirsgirêka jinan haydar bim. Berî diyarîkirina şehîd Fetah ji bo berpirsê partiyê li derveyî welat, ji aliyê rêberiyê ve biryar hatibû dan ku kesanek ji bo vê berpirsiyariyê werin diyarîkirin ku selt(bêjin) bin. Di rûniştinekê de ku di navbera min û şehîd Fetah û Dr. Seîd de hebû, Dr. Seîd got: “*Min ji ber Fetah nine ku kadroyekî jêhatî ê partiyê ye, belku Kejal jî ku Kadroyeke partiyê ye, dê li pêşerojê li derveyî welat ji bo çalaktirkirina pêwendiyên me tevî cîhana derve bi mifah be, lewra min hûn pêşniyar kirine*”.

Mînaka duyem eva bû ku salek ji hatina min bo Ewropayê derbas bibû, PDK Îranê 9’emîn kongireya xwe lidar xist, li gor usûlên partiyê gerek Fetah weke endamê Komîteya Navendî vegeriyaba Kurdistanê, ez jî tevî wî hatim bo Kurdistanê, min Dr. Seîd dît, ji rewşa min pirsî ku gelo ez hînî ziman bûme yan na? Min gellek bi rohn û eşkereyî jê re got ku mixabin min derfet nebûye, şehîd Fetah weke berpirsê defterê naxwaze li ser xerca xwendina ziman îsrarê bike, ji ber ku nekeve ber gazin û lomeyan û ji kesayetiya wî kêm bibe, her li wê demê Dr. Seîd biryar da ku ligel vegerîna min divêt him derfet û him jî hewcehiyên madî jî ji bo min were terxankirin bona vê çendê ku ez hînî ziman bim. Dîsan dubare kir ku kiryara han bi qazancê partiyê ye û di pêşerojê de em dê bikarin bona encamghandina karên din ji hebûna jineke weke Kejalê mifahê bistînin. Çawa Dr. Seîd bername û gelale bona dana caneke teze bi organên din ên partiyê hebû, her bi vî awayî jî piroje bona çalaktirkirina xebat bona çareserkirina pirsgirêka jinan hebû. Şehîd Şerefkendî gellek micid û xwedî helwêst bû, tu tirsek ji vê çendê nebû ku piştevaniyê ji kesanekê/a bike ku ji bo pêşerojê bi mifah in û dê qazanc ji bo neteweya Kurd, bi taybet pirsgirêka jin hebin.

**Pêwendiyên we bi şehîd Humayon Erdelan re çawa bû?**

Min şehîd Humayon her li Kurdistanê dinasî. Em tevî hev heval bûn, şehîd Humayon çend gerran endamê Komîteya Navendî a partiyê bû, gellek berpirsiyarî li stûyê wî bûn, di dema şehîdbûnê de berpirsê komîteya partiyê li Almaniyayê bû, şehîd Humayun û şehîd Fetah dema ku li Başûrê Kurdistanê jî bûn, gellek bi hev nêzîk bûn, her çend ku tu carekê li organekê bi hev re kar nekirine, lê qasê ku min ew dinasî xebatkarekî bi bîr û bawer û biemeg bû, baweriyeke kûr bi rêbaza neteweya xwe hebû, rast û dilpak bû, bi hetik bû, erkên xwe bi başî û ser û ber birêve dibirin, her çend ku mirovek bû ku kêm diaxavt, lê hemû demekê rûken bû, rihsivik, pak û bêgerd bû, asta zaniyariya wî li jor bû, têgihîştî bû, lê tu demekê qala xwe nedikir, hemû demekê ez bîr ji vê çendê dikim ku xedir ji şehîd Humayun hate kirin, çunku tevî kesanekê û li ciyekê hate şehîdkirin ku gellek bi kêmî qala wî tê kirin, riha wî şad û silav li canê wî ê paqij.

**Xatûna Kejel, her weke hûn dizanin Komara Îslmaî berevajî terorên xwe ên berê, di terora Mîkonosê de riswa bû, piştî derkirina biryara Mîkonosê hesta we çawa bû?**

Di rastî de divêt bibêjim piştî çend salan çavnihêrîkirinê, dema ku guh ji biryarek weke biryara Dadgeha Mîkonosê dibî, ku di wê biryarê de îfade bi dirustî û belengaziya neteweyekê û di heman demê de bêtawaniya xweştiviyê te tê kirin, tu seh dikî beşek ji wê birîna bikul û keser kêm bûye, hest dikî ew tiştên ku te qala wan kiriye û lişûn wan de mişextî yî, rast in û xelkê bawerî bi wan aniye, hest dikî ku hêj wijdana mirovahiyê zindî ye, guhdarek heye ku dengê belengaziya te dibihîse, seh dikî ku di cîhanekê de ku rastî dibin goriyê qazanc û berjewendiyan, hinek kes hene ku deng bi lêqewimiya te bidin. Lê her di wê demê de min bi xwe digot: “Kejal ji bo te çi guherî? Ew xweştiviyê ku xîmê koşka xweziyên we li ser bingeha evînê damezrandibû, tu caran venagere? Li hember te nerûniştiye ku ji te re bibêje: “te mêze kir ku ez li ser heq bûm, lê ew neheq? Tu çima sexera min dibî ku me hay ji xwe nine, te dît ku dujminê me hov û har e û bê sûç û tawanekê mirovan dikuje? Mixabin ew zindî nine hetanî ku weke hemû carên berê rûken ji min re bibêje ku dê vegere bo malê û zarokê xwe ê xweştivî hembêz bike û vê carê hewlê bide ku demeke zêdetir ji bo wî terxan bike û ligel wî be û şahidê mezinbûn û pêgihîştina wî be.

Min gellek caran şehîd Fetah di xewn de dîtiye, çavên wî tejî rondik, daxwaza lêborînê dike, dema ku ji xew vediciniqîm, min xwezî dikir ku xewna han rast ba û min ji Fetah re bigota ku: “Ez şanaziyê pêve dikim, tu nigeranê Zagros nebe, niha mezin bûye û ciyê tu nigeraniyekê nine, bêjmê ez her ew kese me ku di nivîsarên xwe ên bi seh de, qala wê dikî û te hêvî bi min hebe, bêjmê ku min her dem hez jê kiriye û hetanî mirinê dê hez jê bikim.

**Niha zirûfa we piştî derbasbûna 15 salan bi ser bûyera Mîkonosê de, çawa ye?**

Piştî şehîdbûna Fetah, guherîneke bingehîn di jiyana min de pêk hat, weke her kesekê ku li xerîbiyê dijî, gellek tiştên nexweş hatne ser rêya min. Piştî derbasbûna çar salan bi ser bûyera han, min biryar da ku jiyaneke nû dest pê bikim, lewra min tevî hevalekî xweştivî, kekê Ehmed Şêrbegî jiyana hevbeş pêk anî, niha li welatê Swîsê dijîm, berhema jiyana min ya vê carê keçeke rind a 3 salî ye ku guherîneke bingehîn di jiyana min de pêk aniye. Di warê jiyana siyasî ve jî ez girêdayî û endamê tu rêxistineke siyasî nînim, ez hez ji PDK Îranê dikim û şanaziyê dikim ku rojek ji rojan ez endamê vê partiyê bûme û her wiha rûmetê bi derbasbûyiya xwe dikim, lê tevî wê najîm. Di heman demê de, heke di pêxema berjewendiya gelê Kurd de, tiştek ji destê min were, ez dê encam bidim. Di warê jiyana civakî ve, weke hemû kesekê/î ku ji xerîbiyê de jiyanê didomîne, min hewl daye ku xwe tevî zirûfa wî welatî biguncînim, min jî para xwe weke beşeke biçûk ji vê civakê mifah ji demê standiye. Min li gor karîna xwe dawî bi xwendin di warê kar û barên civakî de anî û niha weke çavdêrê kar û barên civakî di yek ji nexweşxaneyên bajarê Jinevê de, dixebitim.

**Gotin û nêrîna we a dawî ji bo xwendevan û malbatên şehîdan çi ye?**

Ez spasiya we û xwînerên we dikim. Silav û hurmetên bêdawî dişînim bo malbatên serbilind ên şehîdan, li hember riha paqij a şehîdên Kurdistanê de serî diçemînim, ez hêvîdar im dara xebat û tekoşîna gelê Kurd, ber bide. Îro Kurdistan û herêma Rojhilata Navîn ku gelê Kurd jî yek ji fakteran e, di qonaxeke hesas de derbas dibe, rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî tevî bêzariya bîr û raya cîhanî berbirû bûye, rejîm tu caran tevî kirîzeke wiha metirsîdar berbirû nebûye, gişt neteweyên Îranê niha yê bûne opozîsyon, gişt tex û qatekî wî welatî ji vê rejîmê bêzar in, tu rêyek ji bilî stûxwarkirin li hember daxwazên neteweyên Îranê ji bo vê rejîmê nemaye, ez geşbîn im bi pêşeroja gelê Kurd, bi mercekê ku eniyek ji hemû hêz, alî û kesayetiyên siaysî ên Kurd çê be, çunku sibê direng e.

www.arsivakurd.org

# Ehmed Şêrbegî Pêşmerge, Xebatkarê Kevnar Yê Radyo Dengê Kurdistana Îranê Û Dostê Nêzîk Yê Dr. Seîd Di HevpyEvînek Taybet De

**Hevpeyvîn/ Rehîm Reşîdî**
**Wergeran/ Selîm Zencîrî**

Birêz Ehmed Şêrbegiyê xweştivî, spas ji bo ku we EV derfeta da me da ku em bikarin di bîranîna 15'emîn salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî de vê hevpeyvînê bi were pêk bînin.

Ez jî spasiya we dikim ku we fersend da min di bîranîna 15'emîn salvegera şehîdbûna rêberê mezin û gernas, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî de, çend rûpelan ji xebat û tekoşîna wî rêberê şoreşvan hildim, bêguman ya ku li vir de tê gotinê, kunceke pir kin ji jiyan û tekoşîna wî nemirî ye

**Di 26'ê Xermanana îsal de 15 sal bi ser terorkirina Dr. Şerefkendî, rêberê hêja û navdar yê PDK Îranê û hevalên wî re derbas dibe. Bîranîna han ji bo we çi bi bîr tîne?**

26'ê Xermanana 1371'ê Rojî, roja bîranîna bûyereke tal û bijan e ku hevrîşê gelê Kurd bû. Roja vekolan û serhildana birînek kûr e. Hêj dayîka niştiman û gelê Kurd di bin birîna bieş û bijan ya kevoka di xiwînê de gevziyayî yê gelê Kurd, rêberê zana û nemir Dr. Qasimlo pişta xwe rast nekiribû ku dîsan reşebayê nenas, moma temenê jiyana azadîxwazekî din yê Kurdistanê temirand, dîsan tarîtiya şevê boseya bi kîn û kerb a xwe dan û canê rêberekî din yê Kurd stand û xwîna wî tevî xwîna komek lehengên dinn Kurdistanê de têkel bû, hin kes bûne gorî ku tawana wan tenê misogerkirina xêr û xweşiyê bo Kurdan bû. Ew roj taltirîn û nexweştirîn roj e ku heya niha li tênûsa bîranînên jiyana min de hatine tomarkirin. Xedr û zulmeke pir mezin e ku heya niha ji gelê mafxwar yê Kurd hatiye kirin. Bi eşkere ez dikarim bibêjim ku birîna vê carê gellek ji birîna şehîdkirina Dr. Qasimlo kûrtir, bijantir û taltir bû. Dema ku dilê rêberê mezin û zana Dr. Qasimlo ji lêdanê rawestiya, Dr. Seîd bi jêhatîbûnek zaf û bêmînak, bi hevkariya hemû Kadro û Pêşmergeyên wê demê karî partiyê ber bi wê hêlê ve bibe ku Dr. Qasimlo rêveberiya wê dikir. Bi şahidiya dost û dujminan, dema ku Dr. Seîd cihê mamostayê xwe girt, mirov hest dikir ku Dr. Qasimlo di nava hemû partiyê de amade ye, rast e ku cismê wî li Pirlaşizê bû, lê rih û wijdana wî bû ku hemû rojê li bilindahiya çiya dihat derê û li bilindahiya çiya jî ava dibû.

**Hûn wekî dengekî jêhat û çeleng yê Radyo Dengê Kurdistana Îranê ku we bi salan di çarçoveya berpirsiyariya rasterast a Dr. Seîd de xebat kiriye, di vê derheqê de ji mere bibêje?**

Du roj bû ku Radyo Dengê Kurdistana Îranê dest bi weşana pirogramên xwe kiribû ku 29'ê Cozerdana 1359'an, min bajarê Mehabadê ber bi çiya cih hişt. Wê demê binkeya rêberiya Partiyê li dola "Qelaya Esnan" a ser bi herêma Menguran a Mehabadê bû. Min berê di çapemenî û ragihandina komîteya navendî a partiyê li Mehabadê de kar dikir. Çapemenî jî ji bo çiya hatibû veguhastin. Ez jî tevlî hevalên xwe li çiya bûm. Min ewqas dizanî ku Dr. Seîd birê biçûk yê helbestvanê Kurd, nemir Hejar Mokiryanî ye. Mêrekî şirîn û rihsivik kete berçavên min. Rêdînek kurt û ankardkirî danî bû. Heta ku Xwedê bixwaze rûçik û taybetmendiyên mirovekî şoreşvan tê de dihatin xuyakirin. Her di dîtina yekem de mirov hest dikir ku bi salan e wî nas dike, mirov pêre biyanî nebû.

Her wê rojê, pêşniyaza kar û xebat di Radyo Dengê Kurdistanê de ji aliyê Komîteya Navendî ve bi min hat kirinê. Roja din (30'ê Cozerdanê) min dest bi xebata xwe kir. Yekem roja xebata min di radyoyê de ji kulana çiya bi destê xwe dijwartir bû. Min tu ezmûn û ceribîn nebûn. Sam û heybeta mîkrofonê ez dagirtibûm, bêhêvî bibûm, di xwendin û bilêvkirina peyv û hevokan de melûl û mandî bibûm.


Ehmed Şêrbegî - Dr. Sadiq Şerefkendî

Bi eşkere min ragihand ku eva ne karê min e û ne di şiyan û karîna min de ye. Lê hevkariyên bêsînor yên Dr. Seîd, kek Taha û nemaze mamostayê nemir Dr. Qasimlo bûn sebeb ku zêdetir baweriyê bixwe bînim û ji rênîşaniyên wan mifahê bistînim û li ser karê xwe zal bibim. Kek Seîd tu car xwe ji min dûr negirt. Dema ku guhdariya programên radyoyê dikir, ne tenê şaşiyên min, belkî yên hemû bêjerên din jî serrast dikir. Gellek caran Dr. Seîd wane û dersa şêwaza beyan û bilêvkirina peyvan ji min re digot, bi rastî jî têde lêzan û şareza bû. Dr. Seîd di karê radyoyî de gellek rawraw bû.

Radyo ji bo Dr. Seîd gellekî xweştivî bû, lewra bi dil û can bona serkevtina roj li pey rojê zêdetir a wê dixebitî. Radyo Dengê Kurdistana Îranê bi hejmarek kin ji Kadro û Pêşmergeyên cangorî û fedakar birêve diçû. Ez dikarim bibêjim ku kek Seîd rolek berbiçav û girîng çi li warê kakila programan û çi jî li warê teknîkî ve di serkevtina Dengê Kurdistanê de hebû. Cihê heyrîmanê bû ku ew, wê şiyan û karînê li kur tîne? Dema ku mirov Dr. Seîd didît heya wê radeyê xwe mandî dike, meriv pê şerm bû ku xwe ji kar bidize.

**Dr. Seîd cuda ji berpirs bûnê, bo we çi bû?**

Dr. Seîd di kar û xebata rojane ya radyoyê de wekî berpirsê yekem bû, erkê hizbî û hevaletî, tevlîhev nedikir. Li ser karê hizbî ji ronahiya çavê xwe jî xweş nedibû. Kinc û berpirsatî jêre giring nebû. Di karê hizbî de berpirs û li derveyî karê radyoyê de jî heval û hevyar bû. Erkê hizbî li cihê xwe û hevaltî jî di cihê xwe de. Her çend ku ez hevalê nêzîk yê wî bûm, lê car hebûye ku em li ser karê hizbî ji hev nerihet bin û rexneyên tund ji hev bigirin. Hin caran wiha ketime ber pêlên rexneyên wî ku her xwedê dizane. Lê di jiyana şexsî de em ewqas ji hev nêzîk bûn ku heta ji nepeniyên jiyana malbatî yên hev jî haydar bûn. Dr. Seîd baweriyek kûr bi hevaltiyê hebû. Di dostîniyê de pak û bêgerd bû. Bi qasê ku di karê hizbî de rijd û micid bû, ewqas jî di hevaltiyê de xweyî, nêzîk û meclisxweşker bû. Tim di xem û fikra çareserkirina pirsgirêkên jiyana me de bû.

Lewra dikarim bibêjim ku Dr. Sadiq xêncî wê ku berpirsê min bû, sekreterê min, mamosta, heval, bira, hêz, şiyan, hêvî, hesta şoreşvanî, hander û .... yê min bû.

**Dema bihîstina nûçeyê şehdîkirina wî, te hest bi çi kir û piştre te çi kir?**

Sibêdeya roja 27'ê Xermanana 1371'ê Rojî bû, wê rojê jî wekî hemû rojên din min xwe bo karê radyoyê amade dikir. Bi tenê di oda karê radyoyê de bûm, min çavnihêriya hatina hevalên din dikir. Min hest bi tirs û dilkutînê dikir, lê min nedizanî sedem çi ye. Min pena bire ber Dîwana helbestên Şêrko Bêkes û min helbesta "Heloy Sor" bi dengekî bilind dixwend. Bi tevahî çûbûme nava kûrahiya wê panoramayê ku helbestvan pesna wê kiribû: "Ey tifinga Moînî/ tenê wê demê bibore/ bêje mirovkujan/ ger karîn carek din/ Moînî ji bo te bihînin/ te bigre ser milê xwe". Ji nişkêve kek Taha hate jorê, bi dîtina rengê zer yê wîm hemû cismê min lerizî û gurîzank ketne canê min. Kek Taha bi dengekî xembar û melûl got: "Ehmed, mala me xirab bû, kek Seîd teror kirine". Hêj gotina kek Taha xilas nebibû ku dengê qîjeqîja xweşke Xecîcê kete ber guhê min, ez hişk bibûm û min nedizanî çi bikim, min bawer nedikir. Min hest dikir eva xewn e û nabe ku rast be. Ji dildarên şevê re bibêjin/ agir berbûye dil û hinavên min/ dema ku dipeyivim/ bibe bi demsala xolîbarînê/ ji dildarên şevê re bibêjin ji ber bêhn û bêhnkozîrika cergê min e/ çavên bax û baxçeyan tejî ji av û jan dibin/ hemû wek dayîka min digirîn".

Kulegiriyê qirika min girtibû. Rondik di çavên min de mend mabûn, çavên min reşke pêşke dikirin û peyvên dastana "Heloy Sor" tevlîhev bibûn. Hemû ew dîmen û teswîrên ku rojane Dr. Seîd dihate radyoyê, dihatin ber çavên min.

Pêkenîn û nerihetbûnên wî, dilpakî û

rastiya wî û .... cara dawîn ku bal me bû kê bawer dikir ku êdî kek Seîd venagere û eva sefera dawîn ya wî dibe? Li xerîbî û derve de gorxerîb dibe û dê li cem mamostayê xwe Dr. Qasimlo aram û veheviyêt û soza xwe! "Yan êm dê serkevin, yan em dê şehîd bin û dê te hembêz bikin" bi cih bîne?

Roja ku Dr. Qasimlo şehîd bû, ew nûçeyê bijan min ji Dengê Kurdistana Îranê de belav kir, rûçik û dîmenê Dr. Seîd her pêş çavê min bû, tim ew roja reş li ber çavê min bû ku ez wekî Kundekê nûçeyê mirina Dr. Seîd jî bixwînim, neçar bûm, diviya wî nûçeyê bijan, bi xwîna dilê xwe ji civatên xelkê Kurdistanê re rabigehînim û ji wan re bibêjim ku em dîsan tûşî musîbetê bûn. Her hinde ku mirov şêt nabe û meriv nateqe. Taltirîn, bijantirîn û cergbirrtirîn daxuyaniya Deftera Siyasî bû ku bo cara duyemîn ketibû ser milê min. Lê wekî Êrnêst Hîmîngoy, nivîskarê binav û deng yê Amerîkayî dibêje: "Mirov qet bo vê yekê nehatiye afirandin ku bireve! Renge meriv bihê şikandin, lê tu car nahê bezandin".

**Dr. Seîd çi tesîr û bandorek li ser bîr û jiyana taybet ya cenabê te hebû?**

Yekem tişta ku ez ji şehîd Dr. Seîd hîn bûm, bawerî hebûn bi xwe bû. Wî digot: "Bawerî bi xwe hebûn garantiya serkevtinê ye. Heta meriv bawerî bi felsefeya hebûna xwe nebe, mehal e meriv ji pirsgirêka taliyên jiyanê rizgar be û bi ser astengiyan de zal be. Duyem tişta ku min peyrewî lê dikir: "Pirensîp û exlaqê şoreşvaniya wî bû, her peyvek ku ji zarê wî derdiket, yan her kiryarek ku encam dida, şoreşgerî pêwe diyar bû.

Taybetmendiyek din ya Dr. Şerefkendî eva bû ku nan bi tu kesê re wekî qer nedida, li rûyê mirov de qise dikir, tearof bi kesê re nebû, rexne digirtin, pêşniyaz jî dikirin. Gotin û kiryarên wî hev digirtin. Min nedît û nebihîst gotinekê bike û di kiryar de cîbicî neke, qirnis nebû, gellek sade dijiya, rastî û pakî di hemû kiryarên wî de hebû, mirovekî fantazî nebû, şanazî bi Kurdbûna xwe dikir. Wekî Kurd xwe ne bi kêmî digirt û ne jî xwe mezin dikir. Gellek caran di rê û resmên partiyê de digot: "Ez wekî Kurd çima divêt şermê ji xwe bikim, di halekê de ku Kurdistan take çepera xebatê li dijî rejîmên herî dîktator û paşverû yên wî serdemî ye, berxwedaniyê dike, xwînê dide, gorî û qorbaniyan dide û mala wî kavil dibe".

Şehamet û cesareta Dr. Seîd eva bû ku şaşî û kêmasiyên xwe didîtin, destnîşan dikir û rexne ji xwe digirt. Dr. Seîd tu car xwe di çarçoveya bîrteskiyê de nedihişt. Baweriyek kûr û bingehîn bi pêşeroja geş û ronahiya gelê xwe hebû. Gellek pilan û programên baş, pêşketî û jêhat bo pêşerojê di mejî de hebûn.

Dr. Seîd di dema tengasî û rewşên dijwar û nexweş de bêhêvî û bêhêz nebû. Dema ku rêberê zana û bihagiran Dr. Qasimlo sîngê pak yê xwe kire armanca guleyan û dilê wî ji lêdanê ket, Dr. Seîd ku dizanî çi berpirsyariyek mezin û girîng ketiye stûyê wî, lê bêy wê ku dilê dujmin bi gelê xwe xweş bike, gellek şoreşgerane û zîrekane li peyamek bêsîmî de ku ji bo hêzên Pêşmerge dişand, nivîsand: "Dr. Ebdulrehman Qasimlo Sekreterê Partiya me çû nava refa şehîdên Kurdistanê, xebat her didome". Şehîd Şerefkendî ez hîn kirim ku xwe binasim, li ser pêyê xwe bisekinim, hez ji Kurd û Kurdistanê jî bikim.

**Bi raya te taybetmendiyên herî berçav yên Dr. Seîd di birêvebirina radyoyê de çi bûn?**

Li midehê 14 sal, 2 meh û 23 rojên ku min şeref û şanaziya xizmetkirina di radyoyê de hebû, ji wî midehî nêzîk bi 11 salan û çend mehan berpirsê rasterast yê "Dengê Kurdistanê" û rojnameya " Kurdistan" bû, Dr. Seîd girîngî û pûteyekî zaf dida bi perwerde û pêgehandinê. Hemû ew kesên ku çi li Dengê Kurdistanê û çi jî di rojnameya Kurdistanê de tevî wî kar kirine, şahidiyê bo vê yekê didin ku çi mamostayekî dilfireh û niyetpak bû, çiqas li ser wê yekê tekez dikir ew kesên ku pêre kar dikin, bikarin bi azadî û bi xwasta xwe binivîsin, hayderê mirov bû, berahiya me vekirî hiştibû bo derbirîna hizr û ramanan, nivîsên tu kesê bal wî sivik nebûn, tu kes ji nivîsînê dilsar nedikir, bi başî pêdeçûn bi ser nivîsan de dikir û şaşî destnîşan dikirin, serrast dikir û îcar jêre şirove dikir, zêdetir hay dida ku binivîsîne û ji nivîsandinê netirs e. Lewra nivîsîn ji bo Dr. Seîd cihek taybetî hebû, wî azadiya gelê Kurd li qelemê de didît, hemû cehd û tekoşîna wî eva bû ku nivîskaran perwerde bike. Nivîskarek ku derdê giran yê gelê xwe bibîne.

Dr. Seîd pencereya ronahiya gelê xwe dîtibû, dizanî ku Kurdan tenê ji bo berevanî ji man û hebûna xwe pena biriye bo çekê(sîlah), Kurd ji şer bêzar e, hemû azar û bedbextiyên ku hatibine serê wî, ji şer çavkanî girtine.

Ji bo kek Seîd rohn û eşkere bû ya ku Kurdan îro zêde hewcehî pê heye û hest pê dike, xwendin e, teyarkirina mejiyê xwe bi ronahiya zanistê ye.

Dr. Seîd di karê radyoyê û rojnameya Kurdistanê de, gellek weswas bû, gellek hûrbîn û bêhdar û baldar bû, hemû tekoşîna wî ew bû ku şaşiyek di weşana programên radyoyê de rû nede ku li ser partiyê bibe mal. Li rastbêjî û piristîjdan bi dengê Kurdistanê de rolek berçav û bibandor hebû. Ew rêberekî hêja û jêhat bû, dizanî ku çi dike û çi dixwaze. Digel wê ku radyo bi gotarên xwe dewlemend dikir, herweha hemû ew gotar û nivîsên ku bo belavkirinê dihatin amadekirin, him di warê rêzimanî û him jî li warê rênivîsî de pêdeçûn bi ser de dikir.

Guhdariya mirov dikir, rêz û hurmeta raman û rayên mirov digirt, herçend ku hevrayê mirov jî neba. Atmosferek tejî ji biratî û hevaltî di cihê karkirinê de diafirand. Bi gotinên xweş û şirîn xemê mirov direvandin, tu deman mirov hest bi mandîbûnê nedikir, bi bûna Dr. Seîd zewqa mirov bo karkirinê bihêztir dibû, bi dilgermî ve erkên pêspartî birêve dibiri

**Hûn dikarin hin bîranînên xwe tevî Dr. Seîd bo xwendevanan bas bikin?**

Li midehê ew 13 sal û çend mehên ku min şanaziya hevaltî û hevkarbûna bi Dr. Seîd re hebû, min gellek bîranînên tal û şirîn bi wî re hene.

Di rastî de ez nizanim ku qala kîjanê bikim. Qala camêriya wî, mirovdostî, bivêrî û netirsiya wî yan xakîbûn û pakiya wî bikim?

Yek ji wan bîranînên ku tesîrek gellek mezin li ser mejî û hestê min daniye û dikarim bibêjim ku bû bi pîvanek bo nirxandina taybetmendiyên rêberekê di dema rojên tengahî û dijwar de, vedigere bo 21 salan berî niha, anku bo 25' Gelawêja sala 1365'ê Rojî, dema ku binkeya Deftera Siyasî li gundê kavilkirî yê "Gewredê" li devera Şînkayetî a Kurdistana Başûr bû, wê rojê rê û resma 25'ê Gelawêjê, salvegera avabûna PDK Îranê birêve çû. Hêzên Pêşmerge yên şehîd "Efşîn" û şehîd "Aware" li du operasyonên cuda de mizgîniya du serketinên mezin li dijî hêzên Komara Îslamî li Kurdistanê ji rêya Dengê Kurdistanê ve dane civatên xelkê Kurdistanê.

Hemû aliyek sermestê rêzgirtin ji vê cejna dîrokî û guhdarî ji wê qehremantiya hêzên Pêşmerge bûn, rojek pirr ji xweşî û şadî bi ser birin. Lê şevê sîbera reş a xwe bi ser welat de kişandibû, heval û Pêşmergeyên partiyê ji bo destpêkirina rojek nû ji kar û xebatê hêj di xewa giran de bûn, heyv li esman de bû, stêrk diçilvilîn, demjimêr 1:17 şevê bû ku ji nişkêve bûye gurmên, esman bûye agir, bera gulle, agir û topan binkeya Deftera Siyasî dipîva. Di deqîqeyekê de bi sedan top, qumpare û mûşek diketin xwarê. Komara Îslamî li wê êrîşî nemaze ji çekên Kîmyayî jî mifah stand. Meremek pîs û mirar dişopand, hizra qirkirinê hebû, dixwast darbekî giran bide. Rol û nexşê berçav û şoreşvanî yê Dr. Seîd di wê dema hesas û çarenivîssaz de derket. Di wê cehenemê de ku binkeyên Pêşmerge tejî agir û ..... bû, bêhna Barût û şewitîna dar û beran, wir dagirtibû, di wê dema hesas de veşartgeh bi veşarge digeriya û rênîşaniyên hewce ji bo pûçkirina vê pilana mirar a rejîmê dida xelkê da ku tesîr û karîgeriyên çekên kîmiyayî kin bike. Bûna şehîd Şerefkendî di wê demê de wekî mertalek asinî bû ku li ber wê de mirov xwe ji agirê dujmin biparêze. Wekî çiyayê Jîlwan bi qahîmî sekinîbû, bi cesaret û şehamet ve sîngê xwe kiribû mertal, hebûna wî aramî û dilxweşî dida me, hêviya me bi serkevtin û pêşerojek rohn û geş xurttir dibû. Bêguman Dr. Seîd jî wekî hemû însanên din tirsek di dilê wî de hebû, lê demên wiha de bêy ku xwe bitirsîne û xwe bezir bike, li ser tirsê de zal dibû û dizanî çawan pêre bilive. Şahidên min jî hemû ew kes in ku wê şevê Dr. Seîd dîtine.

**Gotina dawîn ya we ji birêveberên niho yên rojnameya KURDISTAN'ê û Radyo Dengê Kurdistana Îranê?**

Bêguman medya rolek girîng û berçav di hişyarkirina civakê de dilîze, bibandortirîn alev e ku her tevgerek bo pêşvebirina armancên xwe mifahê jê distîne, di rewşa niha de ku nermebayê azadî, demokrasî û projeya Rojhilata Navîn a mezin dest pê kiriye û gellek eyan û bingehîn di deverê de rû daye. Bo Kurd fersend û derfetek giring û zêrîn hatiye pêş û divêt ji vê derfetê bi qazanca xwe mifahê jê bistîne. Medyaya Kurdî û bi taybet "Kurdistan" û Dengê Kurdistana Îranê divêt qala biratî û yekîtiyê bike. Di hişyarkirina ruha netewî de erkê xwe bi awayekî modern ku ligel serdemê niho de hevterîb be, bilîzin niha ku di qonaxek hesas de dibihure, li hemû demekê zêdetir hewcehî bi yekîtiya refên xwe heye. Bûna enî yan bere li navbera hêz, rêxistin, alî û kesayetiyên nava qada xebata rizgarîxwaz a gelê Kurd de hewcehiyek dîrokî ye. Eva peyamek e ku dîrokê xistiye ser milê wan, tenê xurt û qahîmkirina refên me ye ku gelê me yê Kurd ber bi kopika serkevtinê rênimayî dike. Serkevtinê bo tev aliyekê dixwazim û mandînebûnê ji we dikim.


# Dr. Şerefkendî, Şoreşvanekî Mirovhez

**Luqman Ebdulazde**

15 salan berî niha di roja 17.09.1992'an de, perwerdebûyên mekteba sûç û cinayetan, kirêgirtiyên terorîstperwer yên Komara Îslamî a Îranê, di pîlaneke cinayetkarane de ku berê ji aliyê rêber û desthilatdarên rejîma xwînrêj ve hatibû darêtin, rêberê gelê me û Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Dr. Sadiq(Seîd) Şerefkendî tevî çend hevalên xebatkar û şoreşvan yên partiya me, bi navên Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî ya PDK Îranê, Humayûn Erdelan, nûnerê Partiyê li Almanya û Nûrî Dêhkurdî dostê PDK Îranê û xebatkarê azadîxwaz yê Îranî, di Berlîna paytexta welatê Almanyayê de bi terzekî hov û nemirovane teror kirin û carek din gişt xelkê Kurdistanê, bi taybetî Rojhilata Kurdistanê û tev evîndarên rêya azadiya Îranê xembar kirin. Kiryara han di halekê de hate encamdan ku hêj birîna ji destdana rêber, mamosta û mêrxasê neteweya Kurd Dr. Qasimloyê herdem zindî li ser dilê xelkê û bizava azadîxwazane a gelê Kurd û bi taybet PDK Îranê, çareser nebibû.

Diyare baskirin li ser jiyan, xebat, siyasîbûn, şiyan, pirestîj û birêveberiya Dr. Seîd di babetek yan çend mijaran de cih nagire, belku çendîn pirtûkan cî dixwaze.

Ewa ku li vir emê bas jê bikin, dîtina Dr. Şerefkendiyê nemir derheq jiyan û baweriya wî bi wekheviya mafê jin û mêran e.



Şehîdê nemir herdem bi hurmet ve mêzeyî pleyabilindiya jinan kiriye û tu ferq û cudahiyek di navbera jinan û mêran de nedaniye. Bi baweriya Dr. Seîd tenê ferq û cudahiyek di navbera jin û mêran de tê dîtin, ew jî di warê fîzîkî û şekla laş de didît.

Yek ji taybetmendiyên Dr. Şerefkendî dijberîkirin tevî wan kiryar û livînên derheq jinan di nava civaka Îranê bi giştî û bi taybetî civaka Kurdî weke hebûna pirjiniyê, marekirina keçan li ser landikan, jinbijinkirin, dana keçên kêmtemen bi mêrên temenjor û kal û bi giştî zewaca zorî û bêdil a keçan û ...ku di nava civaka Kurdistanê de wekî deb û edet hene. Dr. Sadiq li ser vê bawerê bû ku divêt diyardeyên han bi tevahî di nava civaka Kurdewarî de ji nav herin.

Lê heke niha di welatên pêşketî ên cîhanê de cejn û şahî wekî rêz û hurmetgirtin ji kesayetiya jinan tê dîtin, ji bo welatek wek Îranê ku Mela desthilatdariyê dikin û civaka Kurdewarî a me, erkek girîng û beşeke bipûte ji xebat û tekoşîn li dijî paşverûtiyê ye.

Her wek ku hemû dizanin di Îranê de, jinên xebatkar û azadîxwaz mil bi milê mêrên xebatkar û azadîxwaz, di xebat li dijî rejîmên dîktator ên weke rejîma Paşayetî û Komara Îslamî ya Îranê de beşdar bûne. Gellek şerê jinên xebatkar û şoreşvan di zîndanên rejîma Komara Îslamî ya Îranê de şehîd bûne. Li destpêka şoreşa gelên Îranê, jinan roleke girîng û bêmînak di serkevtina şoreşê de lîstine.

**"Jinên Îran û Kurdistanê, bi taybet yên ku di refa partî û saziyên pêşketîxwaz û şoreşvan de bona azadiyê xebatê dikin, nîşan dane ku di vê rêyê û hemû çeper û meydanên cur bi cur ên xebatê de ji tu mêrekî xebatkar û kêmtir û bêşiyantir ninin."**

Dr. Şerefkendî derheq xebat û tekoşîna jinan dîtin û ramanek bi tevahî Omanîstane hebû. Bona îsbatkirina vê gotinê jî, Dr. Şerefkendî di nivîsareke xwe de dibêje: "ji bîr nekin ku xebata me bona gihîştin bi azadiyê, aliyên cur bi cur hene, ku xebata çekdarî yek ji wan metodên xebatê ye û xebat bona azadiya jinan jî ku nîva civakê ne, yek ji aliyên din ên xebata me ye ku ji xebata çekdarî bona azadiya neteweya Kurd kêmtir nine.

Em hemû dizanin ku di bin siya rejîma Komara Îslamî ya Îranê de tu kes nikare bi pêşerojeke geş û rohn dilxweş û hêvîdar be.

Tenê bi sernixuniya vê sîstemê ye ku em diarin bibin xwediyê mafên xwe.

**Çavkanî:** Pirtûka **Bijartiyek ji gotarên Dr. Şerefkemdî**

www.arsivakurd.org

# Zarok û Xwendewarî

Madeya 28'ê a Peymannameya Cîhanî ya Mafê Zarokan dibêje: "Mafê her zarokekê/î ye ku ji hînkirin û perwerdehiyê bêpar neben û divêt dewlet îmkanên perwerdehî yên destpêkî bi belaş û bi zorî bo hemûyan pêk bîne". Parnameyek ku welatê Îranê jî tê de endam e û gişt madeyên vê peymannameyê pejirandiye. Herwiha di esla 30 a yasaya bingehîn ya rejîmê de hatiye: "Divêt dewlet gişt îmkanatên perwerdehiyê bi awayekî belaş bo gişt neteweya Îranê heya bi dawî anîna dewreya destpêkî û navendî pêk bîne û herwiha gişt îmkanatên xwendinê ên di astên serê de heya ew ciyên ku hewce be bi awayekî belaş bixe ber destê xwendekaran".

Lê di kiryar de ne madeya 28 a Peymannameya Cîhanî ya Mafê Zarokan û ne esla 30 a yasaya bingehîn ya rejîma Komara Îslamî a Îranê ku rejîma han her du ne bi zorî, belku bi terzeke azad û bi dilê xwe pejirandine, nehatiye birêvebirin. Divê were gotin hêj zaf maye ku ew îmkanatên hewce ên elimandin û perwerdehiyê bi awayekê baş û hewce bikeve ber destê xwendekaran.

Îsal xwendingeh di demekê de dest bi karê xwe dikin ku li gor serhejmariyek ku di malpera "bbc.persian"ê de hatiye weşandin, 15 milyon xwendekar li 140 hezar kilasên dersan de mijûlê xwendinê ne.

Li gor serhejmariya han pitir ji %13 ji xelkê Îranê heya niha jî nexwendewar in û pitir ji %5/1 ji zarokên Îranê ji çûna bo xwendingeh û navenên xwendinê bêpar in. Herwiha hejmareke zaf ji zarokan seba hebûna pirsên cur bi cur dest ji xwendinê berdane.

Ji aliyeke din ve, kêmbûna hejmara kilasên waneyan yê bûye sebeb ku di her kilasekê de pitir ji 30 zarokan cî bigirin û 9 milyon ji wan 15 milyon xwendekaran di xwendingehên dudanî de mijûlê xwendinê bin û bi vî terzî Îran di nava 17 welatên ku di warê xwendinê di rewşeke nebaş de ne, xwediyê pileya duyem e.



Evane hemû ji aliyekê û ji aliyekê din ve giran û buhabûna îmkanatên xwendinê weke pirtûk, defter, kîf, kinc û... ku di rastî de di welatê demokratîk de kirîna wan hemû alavan li stûyê dewletê ye, lê di Îranê de ne wisa ye û herwiha xirabbûna rewşa aborî a xelkê Îranê ku di encama siyasetên şaş ên rejîmê de pêk hatiye, bûye sebeb ku gellek ji malbatên Îranî nekarin wan hewcehiyên xwendinê bo zarokên xwe dabîn bikin û li encam de neçar bûne ku zarokên xwe ji xwendinê bêpar bikin.

Pirsiyara sereke eva ye ev hejmar ji zarokan ku li gor serhejmariyan pitir ji 3/5 milyon kesan e, çi dikin ?!

Di rastî de piraniya wan zarokan yan di şeqaman de mijûlê karkirinê ne ku li encam de gellek ji wan ji aliyê kes û girûên nesalim ve tûşî madeyên sirker yan dizî û.... dibin, yan di kargehên raçandina mafûran de mijûlê karkirinê dibin ku li encam vî karî de jî piraniya wan hem ronahiya çavên xwe ji dest didin û hem tûşî zaf nexweşiyan dibin û sîstema leşê/a wan bi tevahî têk diçe.

Bi hebûna van hemû kirîz û pirsên aborî ên li ser rêya malbatên Îranî, derheq xwendina zarokên wan, rejîma Îranê li ciyê wê çendê ku çareseriyeke baş bona vê pirsê peyda bike û bi afirandina delîveyên karî rewşa xelkê ber bi başbûnê bibe û di siyaset û kiryarên xwe de guhertinan pêk bîne, mixabin bi pejirandina gelaleyên nû û ciyê heyirmanê weke cezakirina yek milyon tûmenî bo ew kesên ku nikarin zaokên xwe di dewreya destpêkî û navendî de bişînin xwendingehan, zêdetir xelkê dixe bin zext û givaşên aborî û ruhî de.

Bê wê çendê ku ji xwe bipirsin çima ew dayîk û bav nikarin zarokên xwe bişînin xwendingehan? Bi rastî çi dayîk û bavek hez nake ku zareokên wan di jiyana xwe de serkevin û nebin xwediyê zanist û agahî û têgihîştinê?!

Hêjayê gotinê ye ku astê nexwendewariyê di hemû herêmên Îranê de ne wek hev e.

Li gor wan serhejmariyên nû, Parêzgehên Kurdistan û Azerbayca Rojavayê ku her du parêzgehên Kurdakincî ne, di nav gişt parêzgehên Îranê de di warê nebûna îmkanatên xwendewarî û kesên nexwande û zarokên ser rê û şeqaman, di pileya yekem de ne.

Diyare sedema vê yekê vedigere bo Kurdbûna xelkê van Parêzgehan. Çimku neteweya kurd herdem di xebat li dijî zilm û zordarî û bêedaletiyê de pêşeng bûye û rejîma Îranê bi başî dizane ku zanist û xwendewarî yek ji fakterên herî sereke ên pêşkevtin û zanayiya xelkê û nasiyarbûna wan tevî mafên xwe ye, lewra rejîma Îranê bi pêkanîna asteng û kospan li hember zarokên kurd derheq xwendinê, dixwaze wan ji xwendinê dûr bixe da ku herdem netewaya kurd bê ziman û di bin zilm û zordariyê de be.

Li dawiyê, em hêvî dikin ku zarokên Kurdan li her ciyekê ku bin xwendina xwe bidomînin û bi komkirina zanist û zanyariyan bibin çirayeke ronahiyê bona rizgariya neteweya kurd di bin zilm û zordarî û bê edaletîyê de.

***Hemîd Muxtatî***

## Xelkê Kurdistanê Goriyên Herî Zêde Yên Teqîna Mayînan

Parêzgeha Kurdistanê zêdetirîn serhejmariya goriyên teqîna mayînan yên li ser tixûbê Îranê heye. Ev Parêzgehe bi 230 Kîlometr sînorê hevbeş tevî Îraqê, xwedyê 136 Kîlometr erdê mayînrêjkirî ye.

Dr. Mihemedteqî Pîr Heyatî, berpirsyarê Rêxistina "Bêhzîstî" a Parêzgeha Kurdistanê di civîneke pêşgîrî ji siqet û kêmendambûna welatiyan bi sedema teqîna mayînan li Sine got: Mayînên neteqiyayî yên bermayî ji şerê Îranê û Îraqê li deverên ser tixûbê vê Parêzgehê, her salê dibe sedema kuştin û birîndarbûna hejmareke zaf ji welatiyên Kurd di vê Parêzgehê de.

Wî zêde kir û got: ji ber nebûna girûp û ekîbên pispor ên biyîşkî di herêmên ser sînor bona dermankirina birîndarên teqîna mayînan, vê Parêzgehê hejmara herî zêde a goriyan hebûye û gellek kesên ku namirin jî siqet û nivîşkan bûne.



Hêjayî gotinê ye ku her 4 Parêzgehên Kurdistana Îranê (Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmaşan û Îlam) zêdetirîn hejmara goriyên teqîna mayînan hene. Eva di demekê de ye ku nêzîk 20 sala ye ku şerê navbera Îran û Îraqê bi dawî hatiye, lê erdên bajarên Kurdan, yên mayînrêjkirî ji aliyê dewlwta Komara Îslamî ye Îranê hêj nehatine paqijkirin û her roj goriyan digire

## Sê Sal Cezayê Girtîgehê Ji Bo Ako Kurdneseb Hate Birrîn


Ako Kurdneseb rojnamevanê Kurd di bajarê Sine de, ji aliyê tayê 1'ê a dadgeha Şoreşa Îslamî bi sê sal cezayê girtîgehê hate mehkûmkirin.

Kurûş Fethî, Parêzerê Ako Kurdneseb di hevpeyvînekê de tevî Ajansa Nûçeyan ya Mukriyan, zêdebarê pejirandina vê nûçeyê, ragehand. Tayê yekê a Dadgeha Şoreşa Îslamî ya bajarê Sine, rojnamevanê navhatî li gor madeya 501 ya Yasaya Cezayên Îslamî bi buxtana sîxoriyê, sê sal zîndan jêre birî ye.

Hêjayî gotinê ye ku Ako Kurdneseb, berpirsê beşa nûçeyan di heftenameya civakî, çandî û wêjeyî a Kerftûyê ku di dawiya meha Pûşpera îsal de ji aliyê hêzên ewlekarî yên rejîmê li bajarê Sine de hate girtin ku heya niha jî di girtîgehê de ye.

www.arsivakurd.org

# ÇIMA ZIMAN?



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Her civakek, zimanekî wê yê xweser û taybet heye. Îro li ser rûyê dinê nêzîkî heft hezar zimanên ku têne axaftin hene. Hin him têne axaftin û nivîsandin û hin ji wan jî tenê têne axaftin. Ziman, ew taybetiya ku mirov ji hemû heyberên din vediqetîne ye. Ji nav van heyberan ruhberê ku diaxive û dirame tenê mirov e. Û hiş û hizrandin tenê bi mirov re peyde dibe. Mirov ji ber ku dirame û diaxive jî. Her wiha ji ber ku diaxive jî fikr û ramana wî/wê xurtir û berfirehtir dibe.

Hin taybetmendiyên zimên ên xweser hene. Bo nimûne; ziman, navgîna axaftin û ragihandina navbera mirovan e. Ziman, xwediyê hin rêz û rêzikên taybet e. Ziman, bi civakê re derdikeve holê, pê re geş dibe û dijî. Ziman, pergala ramana neteweyekê nîşan dide. Ziman, kakilê jiyin û behreyên mirov e. Ziman ji dengan pêk tê.

Mirov di jiyana xwe de fêrî gellek zimanan dibe; zimanê ku girîngiya wê nayê nîqaşkirin, zimanê maderî(zimanê zikmakî) ye.

Ji zimanê ku mirov jê dê û bav, malbat û der û dora xwe fêr dibe, re zimanê zikmakî tê gotin.

Ji ber ku mirov wî zimanî di malzaroka diya xwe de fêr dibe, zimanê zikmakî hatiye gotin. Ji bilî Wê jî, ev ziman riknê hemû zimanên din e jî. Lewre gava ku mirov zimanekî biyanî fêr dibe, zimanê zikmakî ji bo xwe wekî bingeh û referans digire.

Zimanê nivîskî, zimanê civakê yê hevpar e. Rojname, kovar, pirtûk, radyo televîzyon û alavên ragihandinê yên nivîskî hemû vî zimanê hevpar bikartînin. Axaftin û vegotina devkî jî bi siya vî zimanê nivîskî bi dest dikeve. Zimanê nivîskî, her wiha wekî zimanê çandî jî tê zanîn.

Axaftin û ziman ne heman tişt e. Ji bo wê divê ev herdu têgeh ji hevdû werin veqetandin. Axaftin, vegotina devkî ya rojane ku bi egera danûstandin û pêwendiya navbera mirovan pêk tê ye. Her mirov dikare biaxive. Belê her mirov nikare li gorî rêz û rêzikên zimên biaxive.

Zarava, ji ber sedemên koçberî, bişavtin, şer û dagirkirinên ku gel an jî neteweyek pê rû bi rû dimîne, pêk tê. Gava ku gel an jî neteweyek ji ser hevdû belav dibe, her kom û komiçkên ku ji hevdû qeyiyane li ser koka wî zimanî, awayekî axaftinê û bilêvkirinê bi kar tîne. Ji şaxên heman zimanî ên ku peyv û dengê wan ji hevdû dibin re zarava an jî diyalekt tê gotin. Hemû şaxên zimên xwe dispêrin koka heman zimanî. Şêwe an jî devok, şaxên zimên ên biçûk ku bi guhertin û veguhertinên ku bi salan pêk tên re derdikeve holê.

Ziman navgîna axaftin û cihêwaziya navbera nîjad û neteweyan e. Hin caran jî wekî zimanekî hevpar dibe qest û qasidê pêwendiya navbera neteweyan. Ziman cîhana awaz û dengvedana navbera netewyan e jî. Her dengek pêkanîna dengekî rengîn û cuda yê ku ji xwezayê der dibe ye. Her zimanek ziman navandina dengekî cihêwaz ê vê cîhanê ye. Ziman neynîka hizr û ramanê û berdevkê hest, nîgaş û nîgariyên mirov e. Mirov dikare her mirovî/ê (an jî civakê) di wê neynikê re bibîne. Neynik, ne tu tiştî li rastiyê zêde dike û ne jî jê kêm dike. Ziman jî rewş û awaya rastiniya takeks û civakê deprêş dike. Her mirov, hem li gorî zimanê xwe tê nirxandin, ecibandin û pesinandin û hem jî li gorî zimanê xwe tê rexnekirin, şermezarkirin û darizandin. Ji bo wê ziman ji bo însên ne wezna hin tiştan; pîvana gellek tiştan e.

Ziman, nîşana awa û çawaniya jiyana mirov û civakê ye.mirov, gellek xislet û xisûsiyetên civakekê ji zimanê ku pê diaxive derdixe. Hemû nirx û hêjahiyên nîjad û neteweyekê yên dîrokî, çandî û civakî bi saya zimên têne parastin. Ber û berhemên wêjeyî bi ziman re der dibin. Ligel wê, gellek şahkarên qedîm û kevnare bi sya zimên derdikevin holê.

Pevgirêdan û dilsoziya navbera mirovan û pêwendiyên wan ên civakî bi saya zimên pêk tên. Têkilî, nêzîkbûn û ahengdariya navbera mirovan, bi xurtbûna zimên pêşve diçe û diedile.

Gellek ramanwer û feylosofên dinê mirov wekî ‘lewirê axivok’ bi nav kirine. Bi rastî jî wisa ye. Heke mirov neaxive, dê çi cudatî di navbera wî/wê û lewirên din de bimîne. Gava ku mirov dêhna xwe dide civakên dîrokî yên ku pêşve çûne hemû pêşî arasteyî zimanê xwe bûne û ew pêş de birine. Hemû zana û feylesofên dinê ji nav civakên ku zimanê xwe dewlemend kirine, derketine. Û dîsa hemû ramanwerên navdar û behredar ên wê civakê jî her gav ji nav zimanzanên wê civakê derketine.

Ji bo wê divê berî her tiştî ziman û dîsa piştî her tiştî ziman were parastin û xurtkirin. Nexwe pêşketin û serkeftina tu civak û neteweyan pêkan nabe.

Kaniya Helbestan

## Vaye Zincîr Şikestin




**Besam Mistefa**
**Hewlêr 27.09.2007**

**Vaye zincîrên şevê şikestin**
**Qels in**
**Roj û mehên vî welatî**
**Henase û lêdan**
**Şev çirayên ronahiyê**
**Me qest in**
*****
**Razin**
**Mişte raz**
**Bi rewneqa bayê sibê re**
**Hestin**
*****
**Neçe ti deveran**
**Dever berbi te ve tên**
**Rê û rêçik**
**Deşt û newal**
**Şar û bajar**
**Di kûzên me de**
**Di mest in**
*****
**Razin**
**Çiya**
**Berf**
**Kuç û kolan**
**Giya û lawir**
**Mirov û derya**
**Bi qedera Xwedê ve**
**Di best in**
*****
**Lê!**
**Xerîbî**
**Tenahî**
**Laşê canê mea**
**Di geztin**
*****
**De werin!**
**Welat digirî**
**Zarokên wî**
**Xwîna giyan**
**Dixwestin!**
*** * ***

www.arsivakurd.org

# Tu Kî Yî...


Îbrahîm Seydo Aydogan

**1.**

Rojekê zilamekî kal hat û li ber dîwarekî rawestiya. Pişta xwe da dîwêr û li ser tutikan rûnişt. Herdu destên xwe dan ber rûyê xwe û dest ponijandinê kir. Bîstikekê weha kûr fikirî û pê re, beyî xwe, serê xwe bi xemgînî kil kir. Bi dû re, destên xwe di kêleka çongên xwe re hêdîka bera xwarê dan û serê xwe spart dîwêr.

Bi vî awayî bêhna xwe berda.

Ji westana ku xwe di niherînên wî re dida der, xuya dibû ku ji rêyeke gelekî dûr dihat.

Xortekî nûgihîştî...
Temenê wî çardeh...
Bejin zirav....
Çavên wî gir û reş.
Rûyê wî xweşik.
Ji westanê jihaldeketî.
Xwe bi tevgerên giranî da kêleka kaloyî û rûnişt.

Çavên kaloyî li rêyê. Çavên lêwik li kaloyî...

**2.**

Kaloyî rabû û bi awirin keserbar li dora xwe niherî.

Lawik jî rabû.
Der û doreke fireh.
Bêsînor.
(Ji dûranê ve, çiyayên biheybet ku serê wan bi mij û dûman bûn xuya dibûn.
Dinyayeke sar. Dinyayeke di destê seqema dijwar de ne di tu halî de...)
Kaloyî serê xwe rakir û li ezmên niherî.
Bi xemgînî.
Bi çavên melûl.
Bi çavên mişt hêsir.
Niherînên kûr. Mîna bîrên bêbinî...

Rê dûr e. Rê dirêj e. Hê gelek heye...

Kesereke kûr kişand, serê xwe bi kerb hejand û bera ber xwe da. Bi dû re mijangên xwe dîsa bilind kirin û di bin wan re ji nû ve li rêya dû xwe niherî.

Diranên wî bi hêrs jidiyan.

Mîna ku mirov li dewsa birîneke kevin binihere.

Mîna ku mirov...
Di pey hezkiriyekê re binihere...

Da ser rêyê û meşiya.
Lêwik jî da dû...

**3.**

Du şev û du rojan meşiyan.
Di nav çend gundên din re jî bihurîn.
Li her gundekî çend xortên din jî bi dû wan diketin.
Li her gundekî, çîrokeke din jî li çîrokan wan zêde dibû.
Li her gundekî pirtir dibûn...

(Du şev û du rojên din jî meşiyan û di nav gelek gundên din re bihurîn. Gelek xortên din xwe da tengala wan. Gelek dilên din jî tev li wan bûn.

Carekê jî nesekinîn û bêhna xwe venekirin.

Qet jî li dû xwe neniherîn.
Her meşiyan…)

Zilamê Kal li pêşiyê, birrê xortan li dû wî.

Ba li wan rabû û baran bi ser wan de bariya. Şil û pil bûn.

Berfê dayê. Heta çongê di nav re çûn.
Serma, seqem,
Nesekinîn.
Her meşiyan…

Rê dûr e. Rê dirêj e. Hê gelek heye...

**4.**

Zilamekî kal.
Por spî.
Rîh dirêj.
Bêdengiyeke kûr...
Meraqa her gundê ku ew tê re dibihurîn, bêtir dibû.
Li pey wî bireke xort...

(Du şev û du rojên din jî meşiyan. Westiyan. Berê xwe dan daristanekê.

Li daristanê, li sitarekê geriyan. Giriyan.

Tava heyvê dawerivîbû ser rûyê çemê zirav û li wan temaşe dikir.

Xişexişa pelan bû...)

Zilamê kal li ezmanê tarî niherî, li daristanê û li çêm niherî. Bi dû re berê xwe da alî û li wan zîvirî.

Got, "Ev we xêr e?..."

Xortekî nûgihîştî. Di çax û benga xwe de. Emrê wî çardeh. Lê belê, situxwar.

Melûl, xemgîn û westiyayî.
Got, "Tu kî yî?.."

(Zilamê kal bersiv neda.

Bîstikekê li wî niherî. Belkî nizanîbû bê diviya çi bigotaya...

Bala xwe da yên din jî û ponijî. Hebekî weha li wan niherî û li ber ket.)

Bi dû re berê xwe guhert, pişta wî li wan, çendakî bi wî awayî sekinî. Pişt re hêdîka rabû, bê dilî, da ser rêyê û meşiya.

**5.**

Zilamê kal dimeşiya. Xort li dû.
Di gundan re dibihurîn.
Li kilam û stranên dengbêjan guhdarî dikirin. Pîrekan ji wan re dilîrand.

Li qiraxa her çemî disekinîn. Çem disekinî. Straneke xweş çawa bisekine, ew jî weha... Rê ji wan re vedikir. Di ser çêm re derbas dibûn. Çem dîsa diherikî. Straneke xweş çawa dest pê bike û biherike. Ew jî weha...

Li ser rêyê gelek kes tev li wan dibûn. Kesên rêwî.

Hin ji wan wendayî. Hin ji wan derketî. Hin ji wan qewirandî.

Û hin ji wan revok...

**6.**

Rojekê dîsa li ber çemekî sekinîn.
Zilamê kal li wan zîvirî.
Niherî.
Got "We xêr e?..."
Xortekî nûgihîştî. Çardehsalî. Por gijolî. Rû xweşik. Çav melûl. Westiyayî.
Got, "Tu kî yî?... "

Zilamê kal serê xwe bi kerb hejand. Nikarîbû bersiv bidaya. Nizanîbû. Vegeriya.

Da ser rêya xwe.
Meşiya.

**7.**

Dem di ber çemekî re diçû. Dem nezan.
Hemû demsalên jiyînê li deverin nenas diman.

Zilamê kal dimeşiya. Xort li dû.

(Êdî êvaran disekinîn û xwe dida bende sibehan. Xwe dida bende bersivan. Yek ji wan jî nedipeyivî.

Kalo tevî bira xortan xwe li daristanan digirt. Weke destpêkê, nêzîkî çeman rûdiniştin. Yekî ji wan agirekî gûr dadida. Tînê dida dilên wan. Tînê dida dora wan. Teyr û tilûran xwe li agirê wan digirt. Pelçîmok, başoke, quling, kund û kevokan jî...

Çi bêdengiya êvarê. Çemê dorê. Dengê dûrik û kilamên ku di guhên wan de... )

Zilamê kal li wan niherî. Wan jî li wî. (Ji ber sermayê di halekî xerab de bûn.)

Westiyayî. Bê xew...

Bala xwe da wan û temaşe kir. Dilê wî bi wan şewitî.

Got, "Vegerin malên xwe, lawo!"

www.arsivakurd.org

(Û deng ji yekî jî derneket.

Şewqa êgir xwe da rûyê wan. Çavên wan biriqîn. Weke ku ne li ser hişê xwe bûn.

Giş dişibiyan hevdu. Yek jî nedişibiya yekî din.

Weke hev rûniştibûn û gişan jî weke hev diniherî. Li pey eynî tiştî bûn. Ji bo eynî tiştî ketibûn rêyê. Gişan qesda eynî deverê kiribû. Hemûyan eynî tişt miraq dikir.)

"Tu kî yî?..."

Zilamê kal fikirî. Li rûyê wan yek bi yek niherî. Bîstikekê li dengê çêm guhdarî kir. Dev li lêva xwe dikir. Li rengê êvarê temaşe kir. Li dengê teyr û tilûran... Li xwezayê... Li bêdengiya wê... Li tarîtiya wê…

Dû re, dîsa li wan zîvirî. Rûyê wî tabloya kerbê. Keserek berada. Dengê wî lerzokî. Neçar.

Got "Ez nizanim bê ez kî me. Hema hûn çi navî li min bikin, ez ew im..."

Xortekî nûgihiştî. Niherînên wî mişt pirs. Di dilê wî de heyecana hînbûna tiştekî nû.

Got "Çawa?..."

(Zilamê kal dengê xwe nekir. Hêsir di çavên wî de li ser hev civiyan. Rûyê xwe guhert. Serê xwe bera ber xwe da. Pişta xwe hêdîka da wan û dîsa meşiya.)

Xortan da dû.

**8.**

Şev û roj li pey hev. Meşiyan.

Roj bûn meh. Meh bûn demsal. Demsal giş li dû man.

Meşiyan.

Nepeyivîn...

(Di gundan re derbas bûn. Ne çol hiştin ne jî beyar. Xwe ji serê çiyayên biheybet bera xwarê dan. Di deştên fireh de bêhna xwe vedan. Deştên ne serî xuya ne jî binî…

Ketin nava şerê eşîran. Yekî ji wan jî guh neda şerî.

Bêrîvanan şîr û nivîşk ji wan re kirin taştê. Kevaniyan nanên şikeva pêşkêşî wan kirin.

Lê yekî ji wan jî lê neniherî.

Zewade bi devê wan nebû.

Çem bi çem. Daristan bi daristan. Welat bi welat...

Meşiyan...)

Zilamekî kal û bireke xort.

Newal derket pêşiya wan. Nesekinîn.

Xwe lê xistin.

Tofan rabû. Guh nedanê.

Meşiyan...

Şev û roj li pey hev. Meşiyan. Westiyan. Lê vê carê negiriyan.

Heryek ji gundekî bû. Giş bi zimanekî dipeyivîn.

Heryek bi zimanekî.

Peyiv ji bîr kiribûn...

**9.**

(Li qiraxa çemekî din sekinîn dîsa. Tarî ket erdê. Dinya sar. Seqemeke dijwar.

Xortan agirek dada. Agirekî gûr. Li dorê civiyan. Hemûyan bi hevdu re bala xwe da zilamê kal.)

Zilamê kal. Zilamekî biyanî. Rêwiyek. Rêwiyekî li vê çolê. Rêwiyekî ecêb. Li çêm guhdarî dikir.

Hêdîka di ser milên xwe re zîvirî û bala xwe da wan...

Xortan jî serên xwe rakirin û li wî niherî.

(Çavên wan ên sor bi şewqa êgir dibiriqîn. Çavên wan xemgîn. Mîna ku li ber wî digeriyan li wî diniherîn...)

Zilamê kal. Ecêbmayî. Heyirî. Dilekî bi miraqan mişt. Deng kubar. Lerzokî. Westiyayî...

Got "Ev hûn kî ne?..."

(Kesî bersiv neda. Gişan li hev niherî ji bo bersivekê.)

Serên xwe bera ber xwe dan. Nizanîbûn bê diviya çi bigotana. Hemû ponijîn.

Zilamê kal dîsa got:

"Hûn kî ne?..."

Xort rabûn û meşiyan. Serî di ber de. Belav bûn. Her yek bi rêyekê de çûn.

Dan nava tariyê û wenda bûn.

Giş dişibiyan hevdu…

Zilamê kal di pey wan re niherî. Weke ku li xortaniya xwe biniheriyaya.

Dilê wî bi wan dişewitî...

Her yek bi zimanekî dipeyivîn.

Giş bi zimanekî...

Heryekî berê xwe bi deverekê ve kir.

Heryekî da ser rêyekê.

Belav bûn û çûn...

# Navenda Çap Û Belavkirina Weşanên Kurdî – SARA Bû 20 Salî

***Agirî:*** *Navenda Çap û Belavkirina Weşanên Kurdî – SARA, sala 1987'an hatiye avakirin û çalakî û xebatên vê navenda xizmetkarê çand, wêje û zimanê Kurdî îsal bû 20 salî. Bi boneya 20 saliya avabûna Navenda Çap û Belavkirina Weşanên Kurdî – SARA'yê daxuyaniyek hatiye weşandin û ji me re jî hatibû şandin.*

*Deqa daxuyaniya han ev e:*

Îsal 20 saliya damezirandina **Navenda Çap û Belavkirina Weşanên Kurdî - SARA**'yê ye. Eva bîst sal e ku SARA li qada cîhanî bi belavkirina wêjeya kurdî dirabe.

Îroj li Arşîvxaneya SARA'yê ji ser 50 hezarî pirtûk, govar, rojname, kasêt, LP, CD, VHS û DVD'yên kurdî komê ser hev bûne.

Berî her tiştî SARA, vê arşîva xwe ya nadîde dixe ber xizmeta nivîsevan û lêkolînerên ku karê wan pêşvebirina ziman, wêje û çanda kurdî ye. Deriyê SARA'yê ji kesayetî û xebatkarên çanda kurdî re her dem vekirî ye.

Her bi vê sedemê, Navenda SARA'yê dîsan dixwaze rabigehîne we hêjayan ku heger we weşanek taybet a kurdî pêwîst be, hûn dikarin bêdudilî vê weşanê ji Navenda SARA'yê bi dest xin.

Her wisan jî em ê gellekî dilxweş bibin, heger we berhemên kurdî yên ji bo belavkirinê hebin, hûn ji çakiya xwe wan ji SARA'yê re bişînin. Yan jî heger di kitêbxaneya we de pirtûkên serzêde hebin, ji çakiya xwe, wan ji SARA'yê re bişînin daku SARA **Împaratoriya Weşanên Kurdî** ava bike.


Her wisan jî, ji çakiya xwe, ji her berhemên nuhderketî, ji Arşîvxaneya SARA'yê re

4 ta 5 nusxeyan verêkin.

Her bimînin şad û bextiya

Digel silavên germ û gurr…

**Goran Candan**



Kurdish Book Bank – SARA
**www.kurdishbookbank.org**
+46 70 791 36 06
+46 8 33 12 29

Navnîşana me:
**KURDISH BOOK BANK - SARA**
**Dalag. 48**
**S-113 24 Stockholm**
**SWEDEN**

www.arsivakurdi.org

agiri

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**



# Çend Gotinên Binirx Ji Şehîd Şerefkendî



"Em, xebatkarên Partiya Demokrat, partiya Şehîdan, gellek bi başî hest bi vî erkê giran dikin ku ketiye ser milê me û me pir bi zanayî biryara yekcarî daye ku hemû hêz û şiyana xwe bo domandina rêya Dr. Qasimlo, yanî rêya xebata bêrawestiyan di pêxema azadî, demokrasî û mafên mirovî de terxan bikin heta di vê rêyê de – ku rêya sor ya Şehîdan e – an em dê serbikevin, an bi rûmet û şanazî ve, em dê weke Şehîdên xwe serî danên"
"Bi hemû hesta xwe daxwazê ji ciwanên xwîngerm û rewşenbîr ên Kurdistanê dikim ku bihêne çeper û meydana xebatê û cihê betal yê Dr. Qasimlo tejî bikin"
"Di nava azadiyên demokratîk de yanî ew mafên ku di rejîmeke demokratîk de ji xelkê re hatine naskirin, azadiya raderbirînê ji hemûyan girîngtir e"
"Heta sîbera dîktatorî û kevneperestiyê bimîne, jiyaneke asayî a bêdeng û bêderdiser ji tu kesê/î re nemumkin e"

# Li Temenê 11 Saliyê De Bûye Dayîk



Li gorî çavkaniya "PUKmedia"yê, Keçek Rûsî li jiyê 11 salî de bûye dayîk û bi wî awayî nav û dengê biçûktirîn dayîka cîhanê bi navê xwe tomar kir.

Ew dayîka zarok, niha 14 salî ye û xwediyê keçek 3 salî ye.

Hevjînê wê jî ku xortekî Tacîkistanî ye, nikare wê jinê mare bike. Ji ber ku Yasaya Rûsiyayê rê ji ber zewaca di bin 18 saliyê de digre.

# Kurdekî Xelkê Ormiyê 135 Salî ye




Li gorî agahiyên malpera Avesta, Hecî Sedo ku xelkê gundê Heştiyanê, li devera Soma li Kurdistana Rojhilatê dijî, îsal di 135 saliya xwe de ye. Ew bavê 4 zarok û 49 neviyan e, 13 nevîçirkên wî hene. Hecî Sedo nikare biaxife. Tenê dikare kurên xwe nas bike, ew jî bi zorê. Heya niha haya kesekî jê çê nebûye.

Ev sûretên ku em diweşînin, gundiyekî wî ku bi xwe melayê gunde, kişandî ye.

# Konferansa Amedê Li Ser Kurd Dest Pê Kir





Li Amedê roja 29 û 30'ê Îlona 2007'an li salona şanoyê ya Şaredariya mezin, Konferansa bi navê **Kurdên li Tirkiyê, Pêwistiyên Bingehîn yên ji bo Pêvajoya Aştiyê'** ku ji aliyê **BARO** ya Amedê û Weqfa **Heinrich Boll** hat lidarxistin.

Di Konferansê de ji gellek welatan rewşenbîr, pispor û siyasetvan beşdar bûn û dê Konferans du rojan dom bike.


Tanrikulu di axavtina xwe de li ser pêwistiya rêya çareserkirina pirsgirêka kurd ya bêyî şiddetê rawestiya û destnîşan kir **ku bêçareserî dibe sebebê têkçûna civakî, çandî û aborî. Herweha înkara kurdan pirsê çareser nake, divê ji bo çareseriyê rê û rêbazên nû werin peydakirin.** Tanrikulu got: **Ew gellek caran weke mêvan beşdarî Konferansên weha bûne, lê niha ew wekî mazûban, pirsê datînin ser maseyê û li çareseriyê digerin**.

Berpirsa Weqfa Heinrich Boll ya Tirkiyeyê, **Ulrike Dufner** bi kurdî silav li beşdaran kir û destnîşan kir ku **pirsa kurd, pirsek mezin, girîng û demdirêj e. Dufner pêvajoyê wek pêvajoyek girîng binav kir û got; divê herkes di vê pêvajoyê de fedekarî bike.**

Li doma konferansê de, rûniştina 'Pêvajoya bi dawîkirina Şeran, Aktorên Pêvajoyê' bi serokatiya parlamenterê DTP'ê Orhan Mîroglu dest pê kir.

*Çavkanî: Semakurd*

# Nîşana "Lojyon Donor" A Firansayê Pêşkêşî Hunermend Şehram Nazirî Hat Kirinê



Mezintirîn nîşana çandî ya Fransayê bi navê **Lojyon Donor** roja Şemî, 29'ê Îlona 2007'an di rê û resmeke berfireh û hêja de pêşkêşî hunermend û stranbêjê kurd yê muzîka "sunnetî" ya Îranê, Şehram Nazirî hat kirinê.

Nîşana "Lojyon Donor" sê derece hene ku kek Şehram bilindtirîn asta derecê, anku Şowaliye Lojyon wergirt.

Heya niha çendîn Îraniyên din jî weke Şîrîn Ibadî, Reza Diqetî, Mehmûd Hisabî, Ebas Kiyarostemî û ...xelata han bidest xistine , lê cara yekemîn e di Îranê de hunermend û stranbêjek Îranî û kurd wê xelata mezin distîne.

Ew xelat di halekê de hate pêşkêşkirin ku ji aliyê Rêxistina Îlmî û Çandî ya Netweyên Yekbûyî (UNESCO)'ê ve kek Şehram Nazirî bi Mewlana Celaledîn Romiyê helbestvan û zanayê mezin hatibû binavkirin.

Hunermend Şehram Nazirî bi boneya wergirtina xelata Lojyonê konserek li Parîsê lidarxist. Wî ew xelate bi mezintirîn diyarî bi xwe zanî ku li midehê sê dehsalên borî heya niha wergirtiye. Herweha got: Eva nîşana ew ked û zehmetê ye ku min di rêya nasandin Mewlana de encam daye û bi vê çendê jî gellek keyfxweş im.

www.arsivakurd.org